



Rojnameger
Celal
Başlangıç:

Medya nikare ji dewletê cuda bifikire

Dewletê bi tenê ew qas malzeme dabûn çapemeniyê, wan jî ji wê pêştir tiştek nenivîsî. Yanî medyayê ji ber xwe tiştek dernexist. Bi destê wan li medyayê hate belavkirin. Hetanî têkiliyên Çillerê bi çeteyan re bi kar anîn, bi taybêti wekî bûyera Ömer Lütfü Topal, yanî anîne wê wateyê ku, çete ji ber berjewendiyên şexsî hatine afirandin. Ev çete têkiliyên politikaya dewletê hatine bikaranîn, bi taktîka şerê taybet hatine bikaranîn û wan jî ji şerê taybet sûde wergirtine.

Rûpel 8-9

Nûçe:

Dewleta tirk kurdan bi kurdan dide qirkirin

Rûpel 3

Hevpeyîn bi Tosinê Reşîd re:


Li dijî gelkujiya sipî jî têkoşîn divê

Rûpel 4-5

A. Kahar Aksoy:

Jiyana şehîdan riya serkeftinê ye

Rûpel 6



SAMI TAN

Ev bîr û ramana çewt ku bi handana hêzên derveyî bûye xencer û li ser dilê me hatin çikandin. Hê jî li ber azadiya gelê kurd dibe asteng û dibe sedema hevkuştina kurdan.

Xudmuxtari û komara Kurdistanê ya mahabadê

Dema mirov bala xwe dide başûr û rojhilatê welêt, tê dîtîn ku di bernameya rêxistinên siyasî de ramana otonomî ango xudmuxtariyê serdest e. Ev rêxistin, modelên pêşketîr (wekî serxwebûn û federasyonê) wekî xewn û xeyal dibînin.

Gelo xudmuxtariyê çawa di nava bernameya van rêxistina de cih girtiye? Xuyaye ku diroka serdestbûna vê modela rêvberiyê dîr û kûr e. Divê mirov bersiva vê pirsê di nava rûpelên pirtûkên dirokê bibîne.

Her wiha şexsiyetên ku wê demê di nav çalakiyan de bûne jî dikarin bersiva vê pirsê bidin. Mamosta Îbrahîm Ehmed yek ji wan şexsiyetan e. Ev jî bersiva vê pirsê di kovara The International Journal of Kurdish Studies de dide. Li gorî wî ew bawerî di dema komara Kurdistanê de kete nava tore û ferhenga siyasîmedarên kurd. Berpîrsên Kurdish Library hejmareke taybet li ser

Komara Kurdistanê ya Mahamadê dextistîne. Di vê hejmara kovarê de, ji kurê Qazî Muhamed Qazî, Elî Homam Qazî bigire, heta Helene Qasimlo, Abdullah Hassanzade, Mahmûd Osman û William Eagleton gelek kesan bîr û ramanên xwe li ser komarê nivîsandine.

Îbrahîm Ehmed li ser vê rûdana dirokî gelek tiştên balkêş dibêje. Bo nimûne mirov ji nivîsa wî hîn dibe ku helwesta rayedarên komarê li hemberî Mele Mistefa Barzanî neyînî bûye. Her wiha wan nexwestina kurdên Başûr di warê berevaniyê de alîkariya wan bikin.

Digel gelek xalên din ên girîng, ji gotinên mamoste Îbrahîm Ehmed diyar dibe ku modela xudmuxtariyê wê demê bi handana rayedarên Yekîtiya Sovyetê ketiye nava bernameya partiyên kurd. Tevî ku ev bîr û bawerî bûye yek ji sedemên hilweşîna komarê jî, siyasîmedarên kurd dev jê bernedane.

Ev bîr û ramana çewt ku bi handana hêzên derveyî bûye xencereke jengarî û li ser dilê me hatin çikandin, hê jî li ber azadiya gelê kurd dibe asteng. Rêxistinên ku di domana dirokê doza xudmuxtariyê kirine, hê jî berjewendiyên eşîrekê, yan şênîyê herêmekê li pêş berjewendiyên gelê kurd digirin.

Em naxwazin her tim qala hinek kêmasî û şaşiyên ku di rojnameyê de derketine bikin. Hefteya çûyî ji aliyê teknîkî ve gelek kend û kosp derketin pêşberî me, ji ber vê egerê jî, hinek nivîs çewt derketibûn. Bo nimûne sernavê hevpeyvîna bi parlamenterê îtalî re xelet derketibû.

Dişa ji ber vê sedemê me ji bîr kir ku em balê bikişînin ser zêdebûna buhayê rojnameyê. Li aliyê din xebatên me yên ji bo amadekirina rojnameyê xweşiktir didomin. Emê bi pêşniyaz û rexneyên we kêfxweş bibin.

Şeref bi rêxistibûnê rizgar dibe

Ferhengok

aramî: îstiqrar
azîne: rêbaz, metod
aya: gelo, ma (acaba)
bal: serinc, diqet
bangawazî: gazî (çağrı)
berz: bilind
beşdar: katilimci
çap: neşir (basım)
çarenûs: qeder
çavêlke: berçavk (gözlük)
cangorî: xwefedayî
damezrandin: avakirin (kurmak)
derbirin: ifadekirin
derfet: îmkan
dezgîrî: kufikî (küftü)
êrbûn: hînbûn, elimîn
fêrdar: hînkâr (öğretici)
gan: giyan, can
gelkujî: tevkujî, qetlîam
gengaz: pêkan, mimkûn
gewşîn: taybetî(özellik)
gotar: meqale
girav: ada
gumankirin: hêvîkirin
hevalbend: mütetîfîq
heyam: serdem(dönem)
hîndarî: xislet
hizîrîn: ramîn, fikirîn
jakaw: hov, weşş
jêgirtin: guhastin, iqtîbas
karwanî: pratîk
kinîyarî: muştêrî
kolzanê: kavi, pag

lêborîn: efûkirin
lêhûrbûn: bi hûrbînî lê nihêrtin
nav û nîşan: taybetî
neft: derkeft, sirgûn
nemaze: bi taybetî
nirx: hêjahî (değer)
nişteçîh: rûniştvan
noker: xulam, cahş
olî: dinî
pawan: tekel (monopol)
pawankirin: wergirtin
rasteqîn: rastî, reel
rasterast: direk
ravekirin: îzahkirin
rêgez: prensîp
risasî: qurşunî
rûdan: bûyer, qewimîn
selmandin: îspatkirin
stewîn: geşbûn, perisîn
şîbak: pace, pencere
şîlûg: şîqal, çapax
telesî: hêvî, bawerî
têgihîştin: fêmkirin
vevxwendin: dawetkirin
wêjevan: edebiyatvan
welam: bersiv, cewab
wer: wisa, wilô, welê
yameti: alîkarî, (yardım)
xaribûn: tefîn, vemirîn
xîlik: sofere
zagon: qanûn
zanyarî: pêzanîn, agahî
zargotin: folklor

BAZÎ BÊKEN

"Rêxistibûn, livbaziya herî dijwar e. Mirovê rêxistî, xwediyê zanebûna herî pêşketî ye, rêxistibûn pêşketina metodên herî hesas e." (serokatiya tevgera azadiyê)

Wateya şerefê ya bîrdozî, nasname û rewşa mirovan e. Şerefa herî mezin ew e ku di bin her mercî de mirov bi şerê xwe serbîlind be. Lê tim ala berxwedanê bi hestên xwe yên neteweyî bide jiyandin. Mirovê ku wan gewşînên taybetî di xwe de nebîne, ew di nava şaristaniya cîhanê de rezîl e û heyanî dawiyê jî belengaz e. Ev jî nîşan dide ku li hemberî her tiştî sernukuzî ye. Serê wî di nav mirovatiyê de ne bilind e. Çima? Ji ber ku rêxistibûn û konevani tê de tune; nasnameyê serbixwe û rasteqîn bi dest nexistiye.

Şeref ew e ku mirov xwedî li xwe derkeve û xwe înkâr neke û piştî xwe tu carî nede hêzên biyanî; lê tim û tim hêza xwe bide welatê xwe û gelê xwe; bi nîrxên xwe re girêdayî be. Wê demê mirov dikare bibêje: "Ez xwedî namûs û şeref im." Dişa şeref ew e ku mirov li axa xwe, rêxistina xwe xwedî derkeve û ya girîng jî xwe ji welat û gelê xwe, neqetîne; ji bo rizgarkirina welat cangorî, dilawerîya zanyarî, kar û

xebatê bide jiyandin. Ev jî bi mirovên zana çêdibe. Mirovê zana, mirovê rêxistî ye. Mirovê ku rêxistî be jî, tim dijî.

Xelasiya mirovan di van pêwistiyan re derbas dibe. Lewra şerefmendî bi xwe rêxistibûn e û ifadeya jiyaneke azad e. Ji ber ku rêxistin hêzeke xurt pêk tîne. Hêz jî dibe bîngeha hurmet û şerefê. Yê ku bibêje ez dixwazim bijîm, pêwîst e ku ew di roja îro de li gorî rêgezên jiyane bîjî. Ji ber ku heke jiyaneke bi

newî ne. Hemû şehîdên şoresê çavkaniya jiyane ne. Bawerîya ku mirov hêz jê digire û pêşiya mirovan ronahî dike, berxwedana şehîdan bi xwe ye. Ev berxwedan jî, azadî, hêvî û rizgariya gelan û mirovahiyê diafirîne. Ev jî bîrdoza PKK ê û rêxistina wê şerefa mirovatiyê bi kar tîne.

Bi taybetî gelê kurd tiştê wî yê herî pîroz xwedî derketina li nîrxên şehîdan e. Ev jî bi baweriyê bêdawî û cangoriyê mezin û vîneke azad pêk tîne. Ev yek xwe di rêxistin û konevaniyê de ifade dike. Şerê ku îro PKK bi bîrdoziyê zanistî li dijî dagirkeran didomîne ji bo rizgarkirina şerê û namûsa mirovatiyê ye. Îro, çima împeryalistên xwînmiy ewqas êrişî ser tevgera azadiyê dikin û wê wekî rêxistina herî xeternak, bi nav dikin? Ji ber ku xelasiya mirovan bi tevgera azadiyê ye. Lewre ew bîrdozeke zanistî digel rêxistîneke xurt li her goşeyê cîhanê belav dike. Ev jî mirina împeryalizmê û hevalbendîya wê bi xwe re tîne. Şerê û namûs, ifadeya xwe di rêxistina rizgariyê de dide xuyakirin. Bêyî rêxistin û konevaniyê xurt ne gengaz e ku şerê û namûs rizgar bibe.

Şerê û heysiyet di riya şerê, rêxistin û livbaziyê de tê karkirin. Heysiyet û rêxistin piştî jiyane ye. Rêxistin nebe, şer nabe. Şer nebe, şerê nabe. Şerê nebe, jiyane jî nabe.

Rêxistin, ji bo her kes û her civakê pêwîst e. Ji ber ku rêxistin hêzeke xurt pêk tîne. Hêz jî dibe bîngeha hurmet û şerefê. Yê ku bibêje ez dixwazim bijîm, pêwîst e ku ew di roja îro de li gorî rêgezên jiyane bîjî.

rêkûpêk û rêxistî nebe riya çareseriyê dernakeve holê. Ango kî dibe bila bibe heger li gorî van rastiyan tevnege, wê bêşereffî, bênasname û bêrêxistinî bibe para wî. Ev jî yekî ber bi tunebûnê ve dibe. Roj bi roj jiyana wî jî dê ber bi helandinê ve biçê.

Tevgera azadiyê ji gelê Kurdistanê re hêzên manewî dane avakirin. Mîna şehîdên adarê, wek Mazlûman û wekî şehîdên firmehê û hemû şehîdên bêmirin (nemir), hêzên ma-

Dewleta tirk kurdan bi kurdan dide qirkirin

Heke mirov piştî avabûna parlamentoya başûrê Kurdistanê, li rewşa wir binihêre wê diyar bibe ku dewleta tirk çawa li kurdan û li Kurdistanê otonom an jî federe dinihêre. Jixwe Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî daxuyand ku ev şerên li başûr pêk tên giştik plan û fikrên dewleta tirk in.

Di 13'ê vê mehê de li başûrê Kurdistanê şerekî nû dest pê kir. Wekî tê zanîn li Başûr heta îro pir caran di navbera PDK û YNK'ê de şer diqewimîn, ji wan şeran re dihat gotin "birakujî." Di 13'ê vê mehê de li Başûr PKK, YNK, PZK, HSDK û PMK'ê eniyekê neteweyî bi navê "Hêzên Yekîtiya Neteweyî" ava kirin. Ev rûdan li gorî derdorên siyasî wê li başûrê Kurdistanê pêvajoyekê nû bide destpêkirin. Pêkhatina eniyekê bi vî rengî daxwaza PKK'ê ya herî girîng bû û PKK dixwest ku li Başûr parlamento ji nû ve were ser kar û artêşekê xurt, ji bo ewlekariya Kurdistanê bê avakirin. Her wiha li hemberî van daxwaz û xebatên PKK, hêzên wekî PDK û YNK'ê tercîha xwe ji aliyê dewletên wekî Tirkiye, Amerika û Îngiltere bi kar anîn.

Li hemberî van daxwazan di pêvajoya Dublinê de, di navbera PKK û PDK'ê de şerek qewimî û bi banga aştiyê ya PKK'ê ev şer qediya. Piştî pêvajoya Dublinê îcar li paytexta Tirkiyeyê li Enqereyê di bin rêveberiya Tirkiyeyê de bi beşdariya Amerika û Îngiltereyê hin civîn pêk hatin. Di van civînan de PDK'ê, PKK wekî partiyekê Bakur û hêzeke kurd nas dikir. Heta gulana 1997'an PDK'ê rûyê xwe nîşan da. Li hemberî vê helwesta PDK'ê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan dadixuyand ku ew li Başûr aramiyê dixwazin û her tiş ji bo vê yekê jî amade ne, her wiha ji bo vê yekê jî divê li Başûr parlamentoya Kurdistanê bê avakirin û ev jî bo Kurdistanê bibe gava yekemîn.

Di destpêka bihara 1997'an de PDK'ê bi dewleta tirk re hevkarîya li hemberî PKK'ê qebûl kir û artêşa tirk bi hêzeke ku ji sed hezar leşker û nêzikî bîst hezar cerdevanî pêk dihat, êriş bire ser PKK'ê. PKK'ê jî li hemberî artêşa tirk fûzeyên SA-7B bikar anîn, di encamê de çar helikopterên dewleta tirk xistin xwarê. Bi vê yekê re artêşa tirk dev ji operasyonê berda. Lê hin hêzên xwe yên zirxî ji bo ku PDK'ê li hemberî PKK'ê biparêzin hiş-



tin. Di vê pêvajoyê de PKK'ê PDK di qada şer de têk bir û PDK li cihê ku bersivê bide banga aştiya ku PKK dixwaze; careke din artêşa tirk vexwende başûrê Kurdistanê.

Piştî ku artêşa tirk ji Başûr derket HSDK, PMK, PZK, YNK û PKK'ê êriş ser PDK'ê kirin. Armanca vî şerî jî berê ve kifş bû, ku PDK bi çaran li hemberî hêzên din artêşa Sadam anîbû başûrê Kurdistanê û îcar jî dibû cara duyemîn ku wê artêşa tirk diami başûr. Ji ber vê yekê hêzên din li hemberî îxaneta PDK'ê hêzeke neteweyî pêk anîn. Gava mirov piştî şerê kendavê li rewşa başûrê Kurdistanê, binihêre wê gavê pir baş kifş dibe ku, dewleta tirk çawa li kurdan û li Kurdistanê otonom an jî federe dinihêre.

Jixwe Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî daxuyand ku ev şerên li Başûr pêk tên, giştik plan û fikrên dewleta tirk in, lewre ew naxwaze li herêmê aramî pêk were. Dîsa, li gorî Öcalan dewleta tirk vê daxwaza xwe jî bi riya PDK'ê tîne cih. Dewleta tirk tu car naxwaze ku federasyonê li Başûr ava bibe. Bi taybetî di dema serokwezîrtiya Tansu Çillerê de bi awayekî rasterast ev yek-hate gotin.

Di vê merhaleyê de hêzên Başûr yê din hem jî bo ku dawiyê li îxanetên PDK'ê binin û hem jî li hemberî bombebarankirina balafirên dewleta tirk; bi navê Hêzên Yekîtiya Neteweyî; YNK, PKK, PZK, HSDK û PMK bûne yek li hemberî PDK'ê di 13 kewçêrê de şer dane destpêkirin.

Li ser vê yekîtiyê fermandarê ARGK'ê Osman Öcalan daxuyaniyek da MED-TV'yê. Öcalan berê pêşîn daxwaza aştiyê bi PDK'ê re anî zimên, pişt re jî li ser bingeha avakirina vê hêzê û armanca wê daxuyaniya da. Osman Öcalan da zanîn ku wê Yekîtiya Neteweyî bimeşe, divê PDK dev ji îxanetê berde, hêzên dewleta tirk jî Başûr dîr bixe.

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî roja 18'ê kewçêrê di MED-TV'yê de bi telefonê beşdarî bernameya bi navê Panel bû. Öcalan da zanîn ku şerê li Başûr pêk tê, şerekî kurdan nîn e, ev şer plan û armancên dewleta tirk in. Öcalan banga aştiyê li hemû hêzên Başûr kir ku di demeke kurt de dev ji şer berdin, ji bo çareserîya pirsgrêkên gelê kurd xebatê bikin. Öcalan daxuyand ku heke li Başûr aramî çêbe û aşî pêk were wê jî bo Tirkiyeyê jî bibe destpêka pêvajoyekê nû û wê rê li ber hêzên azadîxwaz vebe ku li Tirkiyeyê komareke nû saz bikin.

Hwiha li Tirkiyeyê jî hin nivîskarên quncikên rojnameyan rasterast nebe jî tîkçûna artêşa tirk û bîpolitîkabûna parlamentoya tirk rexne dikin. Nivîskarê rojnameya hefteyî Gazete Pazarê Ömer Laçiner li ser rûdanên dawî radiweste û di de xuyandin ku qedandina hêzeke wekî PKK'ê ne mimkûn e. Ji ber vê yekê divê riya aştiyê bê ditin. Dîsa nivîskarê Hürriyetê Yavuz Gökmen jî dibêje ku ev şerê birakujiyê di navbera PKK û artêşê de divê êdî bê qedandin.

M. AKSOY

Kurtenûçe

NÇM

(Navenda Çanda Mezopotamya), roj bi roj karûbarên xwe yê nîşanê warê çand, ziman, dîrok û wêjeya kurdî de bi pêş ve dibe. NÇM piştî şaxên Stenbol, Edene, Amed, İzmir, Mersin û Hewlêrê niha jî li Rihayê roja 25'ê kewçêrê şaxeke din vedike. Ji bo vê yekê Navenda Çanda Mezopotamya bi sloganên wekî: "Çanda me bi NÇM'ê geş dibe" û "Çanda şoreşê li NÇM'ê tê afirandin", bang li gelê kurd dike. Di vê bangawazê de ji gelê kurd tê xwestin ku piştgiriya bidin saziyê.

Li ser navê

Komelaya Malbatên Girtiyên (TUAD) Halis Doğan, Gazî Ergin û Nurettin Gök, bi daxuyaniyê çapemeniyê li dijî kiryarên hovane yê ku li girtigehan diqewimîn ji raya giştî piştgiriya xwestin. Di daxuyaniyê de tê gotin ku TUAD, di şehadeta 10 girtiyên ku li Zîndana Amedê hatibûn kuştin bi bir tîne û di tîkoşîna girtiyên de ewê bi wan re bin. TUAD di daxuyaniyê de balê dikişîne ser girtigehên ku grevên birçîbûnê didomin û dibêje ku divê tu kes çavê xwe ji wê yekê re negire.

Ji bo Leyla Zana

Ku 15 sal cezayê hepsê ji hêla dewleta tirk ve lê hatiye birîn; li ber Kongreya Amerîkayê greva birçîbûnê hate lidarxistin. Di nav çalakdaran de kesên mîna Seroka İttifak Mafên Mirovan ya Amerîkayê Kathryn Porter û Berpirsê AKIN'ê Kanî Xulam jî hene. Her wiha mûzisyen Bianca Jagger û parlamentere Californiya Bob Filner ku piştgiriya vê çalakiyê dikin, ji Bill Clinton daxwaz kirin ku ji bo Parlamentera kurd Leyla Zana zorê bide ser Tirkiyeyê.

Li Dijî girtina Eşber

Yağmurdereli li Tirkiye û li Ewropayê reaksiyonên tûj bilind bûn. Berdevkê Wezîrê Karê Derve yê Almanyayê Markus Ederer da zanîn ku girtina Eşber Yağmurdereli ji hêla azadiya raman û demokrasîyê ve, rûdaneke gelek xerab e. Ederer der barê mijarê de bi bir xist ku Wezîrê Karê Derve Klaus Kinkel roja 27'ê adarê dema li Stenbolê bû, bi Yağmurdereli re hevdişînek pêk anîbû û ji bo vê yekê jî ji Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyeyê İsmail Cem xwestibû ku der barê Yağmurdereli de hesas bin.



Helbestvan û çîroknivîsê kurd Tosinê Reşîd:

Li dijî gelkujiya spî jî têkoşîn divê

HEVPEYVÎN: JANDOST

Em hêvîdar in ku hûn xwe ji bo xwendevanên me bidin nasîn?

● Ez di sala 1941'ê de, li gundê Kûreken-dê (niha Fêrik), li Komara Ermenîstanê ji dayîk bûme. Malbata me ji ber zordariya olî di sala 1878'an de ji gundê Esmer, ji hêla Dêrika Çiyayê Mazî koçberî Rûsyayê bûye. Bavê min, Reşîdê Ozman, sêwiyekî ku bi zorê ji tevkujiya Roma reş filitîbû. Ew tu caran neçûbû dibistanê, lê ew bi xwe fêrî xwendin û nivîsandina rûsî bûbû, zarokên xwe gişk dane xwendin.

Xwendina min bi zimanê ermenî bûye. Piştî dibistana navîn min xwendina xwe li beşê fizîk û kîmyayê, li Înstîtûtiya Yêrêwanê (Erîvan) ya pêdagogiyê berdewam kiriye. Di sala 1975'an de min têza xwe ya doktriyê pawan kir û bûme doktorê kîmyayê. Salên dirêj pêşî li Ûnivêrsîtêya Yêrêwanê, paşê jî li Înstîtûtiya akademîk min karê zanyariyê kiriye.

Ji destpêka salên 60'î ve min dest bi

Gundê me, ku serî binî sî mal bû, wekî giraveke biçûk bû di derya gundên ermeniyên de. Pêwendiyên gundiyên me her roj bi ermeniyên re hebûn, lê dîsa jî di nav hev de tenê bi kurdî dipeyivîn. Di nav gund de şerm bû ku tu bi zimanekî cihê dipeyivî.


nivîsandina helbest, çîrok û gotaran kiriye. Dawiya salên 70'yî min êdî ji bo wan kovar û rojnameyên kurdî yên ku li ewrûpâyê çap dibûn, dinivîsî. Heta niha çar pirtûkên min çap bûne; sisê jî wan berhevokên helbestan a din jî şano ye. Ew qas jî ji bo çapê amade ne. Min çawa helbest û çîrok nivîsîne, wisa jî min gotar û pirtûkên li ser kurdan jî ji zimanê ermenî û rûsî li kurdî wergerandine.

Wekî hate zanîn we jiyan xwe li Sovyeta berê borand, xwendina we li wê derê bû... Gelo çi bûn sedem ku hûn bi zimanê gelê xwe ve werin girêdan, bo çi we bi kurdî nivîst?

● Ji bo me pêwistiya ku em bi zimanê xwe ve bîn girêdan tune bû. Zimanê kurdî, zimanê dayîk û bavê me, zimanê kalîk û pîrikên me bû. Di mala me de ew ziman tenê dihat bikaranîn.

Gundê me, ku serî binî sî mal bû, wekî giraveke biçûk bû di derya gundên ermeniyên de. Pêwendiyên gundiyên me her roj bi ermeniyên re hebûn, lê dîsa jî di nav hev de tenê bi kurdî dipeyivîn. Di nav gund de şerm bû ku tu bi zimanekî cihê dipeyivî. Di vî pîrsê de çawan tê xuyayê ola êzdiya jî roleke pozî-

tîv listiye. Ji ber ku ji şîn û şahiyên heta nîmê û dîrokên me gişk bi zimanê kurdî ne. Paşê jî li Azerbeycanê û Tirkmenîyayê bi sed hezaran kurdên misilman a sîmîle bûn, bûne azêrî û



dîtin?

● Piştî mirina Stalîn ji bo kurdariyê astengên mezin tunebûn. Kurdariyê bi xwe çawa konevanî, siyaset ta nîveka salên 60'an di nav me de bi giştî tunebû. Di pîrsa kurdariyê de kurdnasê mezin Qanatê Kurdo mamosteyê min bû. Kê ew nas dikir baş dizanibû ku kurdariyê jê dibarî. Ew zanyarekî rast, şoreşgererekî bêtirs bû. Di sala 1955'an de wî helbestên Cigerxwîn jî min re şandin û xwest ez wan ji ber bikim. Min cara yekemîn kurdiya bi alfabeya Celadet Bedirxan dît, bi serê xwe tip ji hev derxistin û ew helbest xwendin. Dû re ez wisa jî fêrî tipên erebî bûm. Vê carê pirtûxaneya Qanatê Kurdo ku bi pirtûkên kurdî û yên li ser kurdan dewlemend bû, dostaniya bi wî zanyarê mezin re ji min re bû dibistana kurdariyê. Min helbesta xwe ya yekemîn bi giyana kurdariyê di sala 1961'ê de nivîsî.

Piştî demeke ji jiyaneke dirêj we terka Sovyetistanê kir û we berê xwe da Awîstralyayê (Nemsa). We tore û wêjeyayê kurdî li wir çawa hişt, ango rewşa wêjeyayê kurdî li wir

tirkmen, bi tenê kurdên êzîdî man ku karibûn ziman û çanda xwe biparêzin.

Rûmetgirtina ziman û çanda kurdî ji bav û kalê me dihat. Gava sala 1963'an me Komeleya Xwendakarên Kurd li Yêrêwanê damezrand, biryara yekemîn ew bû ku divê civîn û rêvebirina karê komeleyê gişk bi zimanê kurdî bin.

Ji bo nivîsandina bi zimanê kurdî jî, birayê min ê mezin, helbestvan Rizaliyê Reşîd; zêdetirî 40 salî zarokên gundê me fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî kirin. Ji wan zarokan yek jî ez bûm. Ez bawer im ev jî bo ronakbîr û welatperwerên kurd nimûneyeke hêjayî çavdayîne ye.

Divê mirov li ziman û çanda xwe xwedî derkeve. Ev yek divê wek gotinên vala nemînin. Gundiyên me, ji serokê gund û mamosta bigire, heta şivan û gavanê ku qet rojname nedixwendin jî, gişk dibûn aboneyên rojnameya kurdî "Riya Teze". Em di kurdariyê wîha digehîştin.

Di helbestên we de bêhna kurdariyê bi awayekî êşkere difûre, gelo we çawa karibû di welatekî komûnîst de kurdariyê binin zimên? Ango we tu asteng ji bo vî yekê ne-

çawa bû û niha di çi şêwe û radeyê de ye?

● Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê rewşa kurdên wir li her derê xerab bû. Ji kurdên Ermenîstanê em dikarin bibêjin ji sedî heştê koçber bûne. Beşa Kurdî ya Radyoya Yêrêwanê dema wê ji saet û nîvekê kirin çil û pênc deqîqe, rojnameya "Riya Teze" ku bi navberî ji sala 1930'î bi alîkariya dewletê hefteyê du rojan çap dibû, niha tu alîkariyê ji dewletê nagire û wisa bûye ku ji du-sê hefteyan carek çap bibe. Şanoya kurdî, komên folklorê kurdî neman. Wekî din em dikarin bibêjin ku li gorî siyaseta fermî êzîdî ne kurd in, her wiha li pêşiya tore û wêjaya kurdî astengên mezin hene.

Ez dixwazim li vir nimûneyekê jî binim. Berî ku ez ji Ermenîstanê derkevim, min sal û nîvekê di Beşa Kurdî ya Radyoya Yêrêwanê de kar dikir. Min di gotareke xwe de ya li ser şerê çekdarî de ya li bakurê Kurdistanê de, got wekî PKK çawan Diyarbekirê di pêşerojê de serbajarê Kurdistanê serbixwe dibîne. Pişt re serokatiya radyoyê gazî min kir û ji min re got, wekî Diyarbekir bajarekî ermenan e, li Ermenîstana rojava û mafê te tune tu tiştên wisa binivîsî.

Min gelek helbestên we û hevkarên we xwendine, bi rastî xweş in û çêşnên şîrîn in di toreya kurdî de. Lê ya ku min bala xwe daye, muzîka helbestên we hemûyan nêzikî hev e, yanî hûn tev de li ser kêşeyekê (wez) meşiyane. Gelo çima, we nikaribû kêşeyên muzîka helbesta kurdî bi kar binin?

● Ez di vê pirsê de ne bi te re me, diyar e ku kêma pirtûk gihîştine destên te.

Pirtûka min ya yekemîn berî neh salan ji ber du sebebên çap nedikirin. Yek, ji min re digotin: "Tu dinivîsî 'tav', lê divê biniyîsî 'tava sovyetê'." Dixwestin ez helbestan li ser Partiya Komûnîst, sosyalîzm, Ermenîstanê, dostiya gelan binivîsim, min ji nekaribû binivîsim. Ya duyemîn jî ew bû ku digotin kêşeya helbestên min ne wekî şairên hene. Ez nizanim ji min re çiqas li hev hatiye, lê gava min helbest dinivîsî; stranên kurdî, lawik û heyranok di guhên min de bûn, min dixwest helbestên xwe bi kêşeya wan binivîsim.

Tesîra çanda rûsî bandoreke çawa li ser we hîşt?

● Bêguman hem bandora çanda rûsî û hem jî ya ermenî li ser min heye, lê ew tesîr sal bi sal kêma dibe. Bi bawerîya min niha tesîra folklorê kurdî li ser min zêdetir e.

Problem ew e ku nivîskarên ji başûrê Kurdistanê, yên bi kurmançiya jêrin (sorani) dinivîsin em ji nav derxin, yên

din giş bi çand û zimanê gelên serdest hatine perwerdekirin...

● Berê pirtûkên kurdî kêma bûn, ên hebûn jî nediketin destê her kesî. Ya duyemîn jî pirtûkên ku hebûn jî ne li gorî daxwaza te bûn û tu neçar dimayî û te dest diavêt pirtûkên bi zimanê biyanî û bi zimanê gelên serdest. Niha pir caran em bi pîvanên wêjeya gelên serdest berbirî berhemên hev û dû dibin. Ji ber ku ew pîvan ji carina ne wekî hev in û wisa dibe ku hinek kes giraniya heja nadine berhemên hogirên xwe, yên ji parçeyên Kurdistanê mane yan jî ji Kurdistanê derketine.

Mamosta Reşîd di nivîsandina kurdî de heta niha sê rengtîp (alfabe) tên bikaranîn: Kîrîlî, erebî û latîni. Ev ji dibe astengeke mezin li ber xwendevanên kurd û belavkirina pirtûk û berhemên kurdî. Di nêrîna we de wê ev pirsgerêk çawa çareser bibe? Hûn kîjan alfabeyê çêtir dibînin ji bo zimanê kurdî?

● Hema di destpêkê de ez dixwazim bibêjim ku alfabeya kîrîlî rejîma Stalîn bi zorê li stûyê me pêçayê û em çiqas zû ji wê rizgar bibin ewqas baş e. Bi bawerîya min alfabeya bi tîpên latîni hê bêhtir li gorî dengên zimanê kurdî ye. Ew alfabeya ji bo fêrbûnê hêsa ye û di rewşa gelê me ya îro de, gava piraniya gelê kurd nikare di dibistanan de zimanê xwe bixwîne, bi milyonan kurd li cîhanê belav bûne, ev şertekî pir girîng e. Ew pirsêka din e ku alfabeya em îro bi kar tinin kêma û kurtiyê wê hene. Lê ew pirs di pêşero-

jê de bi hêsanî çareser dibe.

Lê sed mixabin kurdên me giş ne li ser vê baweriyê ne. Li başûr û rojhilatê Kurdistanê rewş cihê ye. Ji aliyekî ve rêjîmên li ser hukim ew neçar dikirin ku tîpên erebî bi kar binin, ji aliyê din ve hogirên me yên ku bi kurmançiya jêrin dinivîsin jî ji dil naxwazin dest ji tîpên erebî zû bi zû bikşinin.

Wekî penaberekî kurd, li welatê xerîbiyê, mesajeke we heye hûn bibêjin?

● Îro, gava bi milyonan kurd koçber bûne û roj bi roj hejmara wan zêde dibe, ji bo me hemûyan yek ji pirsên sereke parastina kurdbûna wan e. Di vê rewşa sazûyê de ji bo ku mirov kurd bimîne, divê bi kurdbûna xwe serbilind be. Lê ji ber ku mirov bi kurdbûna xwe serbilind be, divê ziman, dîrok û çanda xwe baş bizanibe.

Dijmin her derfeta ku di dest dewletê de heye bi kar tîne, wekî kurdbûnê li ber çavên kurdan reş bike, wan jî dîrok û çanda wan bêpar bihêle, zimanê wan bide jibîrkirin. Ev şerekî ne diyar e, gelkûjiya spî ye û li dijî vî şerî jî têkoşîn divê. Ji ber vê jî çî rêxistinên siyasî û komelên civakî, çî çapemeniya kurdî û welatperwerên kurd, di karên xwe yên her rojî de, divê cihê bidine vê berxwedanê. Eger em îro vî karî nekin, emê bi milyonan kurdan winda bikin û ji bo vê di pêşerojê de tu lêborîn wê tune be.

A. WELAT/AWISTRALYA

Min di gotareke xwe de ya li ser şerê çekdarî de ya li bakurê Kurdistanê de, got wekî PKK çawan Diyarbekirê di pêşerojê de serbarjarê Kurdistanê serbixwe dibîne. Pişt re serokatiya radiyoyê gazî min kir û ji min re got, wekî Diyarbekir bajarekî ermenan e, li Ermenîstana rojava û mafê te tune tu tiştên wisa binivîsî.

Divê em berjewendîperest û gelperweran ji hev derxin

CELALETTİN YÖYLER



Kiryarên çavîk û keran qet nakevin pirtûk û defteran. Belê bi rastî jî kiryarên nokerên xwefiroşên neyarên kurd û Kurdistanê, ne di pirtûkan de, ne jî di defteran de tên bicihkirin. Lewre kesê ku hîni nokeriya kesekî bibe tu dem û tu gavê ew kes nikare palana xwe ya nokertiyê ji ser piştê xwe bavêje û berde.

Ev bû nêzikî pêncî salî ku kurdên li başûrê Kurdistanê xwîna xwe li serê çiyar û zinaran dane rijandin û hatin jardadayîkirin û bûne penaber û koçber, li her deverên cîhanê û di welatê xwe de, lê pir mixabin ewên ku bi navê kurdayetiyê serokatî li wan dikirin, pirên wan, wekî malbatê Barzaniyan xwîna wan her ji bo berjewendiyên xwe yên malbatî û eşîrî û feodalî dane rijandin. Mînaka herfî mezin û berbi-

çav îro li meydanê ye, wekî çawa ku gur bi vê binemalê girtibe û avêtibe nava koza berxan wisa lê hatiye. Gazî tirk û tirkmenan kiriye û ji xwe re, ji welatê xwe re xistiye çavdêrê hêza aşîtiyê, di navbera xwe û Celal Talabanî de ji wan her duyan wer tê ku ew welatê ku çil milyon kurd li ser dijîn, welatê bavê wan bi tenê ye.


Dema mirov ji aliyê doza neteweyî ve bala xwe bide wan, her du ji hev zêde ne cuda ne. Her çiqas Talabanî ji Barzanî moderntir xuya bike jî, heke bi rastî û dirustî xudanê doza gelperweriyê bûya, ev qas sal in li dû dijîmîne kurd û Kurdistanê û li ba wan nedibû. Hêma jî wê bersiva Kongreya Neteweyî bi dil can ji bo berjewendiyên gelê kurd bida.

A bi van ramanên û ponijandinan em nikarin bibêjin ku Talabanî, hêjayî serokatiya tevgera kurd e. Ew jî xudanê sûc û gunehên pir mezin e, li hemberî her şoreşgerî û xwenas û zanayî, hem jî li hemberî her kurdî. Bi rastî dema Talabanî helwesta xwe ye neteweyî û kurdayetiyê li hemberî Barzanî bi van ramanên rastîn, kurdayetiyê daniya holê, rewşa Başûr nedihate ve ra-


deyê. Talabanî dema neketa nava gemariya parvekîrma Başûr; di navbera xwe û Barzanî de, hem jî li mala dijîmîne bi hezaran kurd û xwînrêj û tevkujê wan, civîn û lihevhatin bi Barzanî re li dar nexista û neba mewanê MÎT'a tirkan û Tansu xanimê, rewşa Başûr nedihate ve radeyê. Em kesên kurd her tim di nivîs û rexneyên xwe de êrîşî ser xayîne mezin Barzanî dikin, lê bi rastî xirabî di pir kesan de heye, em jî çavê xwe digirin û tim êrîşê hêlekê ku rewşa wî jî di kûrahiya dîrokê de diyar e, dikin û qet nabêjin evê hanê jî xudanê para xirabiyê ye, bi qasî kiryarên xwe yên nelirê û ne di berjewendiyên gelê kurd de.

Em baş bizanin ku serkeftin her ji bo hêzên neteweyî û welatparêz û mirovahiyê ye. Serşorî û feşalandin û riswayî jî, her ji bo malbatperestan û pêgehperestan û xayînan û xwefiroşan e. Mînakên şoreşên ji bo rizgariya netewe û gelan, ji bo rizgarkirina çînan ji bin destê sermeyadaran di dîroka cîhanê de bi hezaran in. Bi rastî kesên ku têkoşîna ji bo neteweyan an jî ji bo çîna karkeran kirine, diyar in.

Jiyana şehîdan riya serkeftinê ye



Heval Mazlûm, çaran û şehîdên 14'ê Tîrmehê, bi şehadet û cangoriya xwe pelege nû di dîroka reş û tarî de vekirin. Li hemberî van cangoriyan partiyê dest bi şerê gerîlatiyê kir. Piştî heştê û çaran piştî şehadeta heval Egîd ARGK hate damezirandin.



Ew kesên ku di her demê de ji bo doza civakî, neteweyî û daxwazên berz singa xwe bidin ber zor, zehmetiyan, di ber doza azadiya gel û neteweya xwe de can bidin, şehîd in.

Gelên bindest di her heyamê de têkoşîna azadiyê dane. Ji bo ku bigihêjin jiyaneke bi rûmet gelek şer kirine û gelek şehîd dane.

Dîroka welatê me jî heta îro bi êş û jan e. Her dem mîna çem xwîn diherike lê em hê jî bindestî û koletiyê xelas nebûne.

Li Kurdistan çiqas berxwedan û serhildan çêbûn, li hemberî wan jî ew qas zilm zordarî û xwînrijandin pêk hatîye.

Belê, dema ku em li dîrokê dinêrin di serhildan û berxwedanên ku li Kurdistanê pêk dihatin de gelek şehîd hatine dayîn. Lê belê ji bo çî gelê me serxwebûn û azadiya xwe bi dest nexist? Berî her tiştî heger gelek li ser nîrxên şehîdên xwe û di cangoriya wan nefikire û li ser wan nesekine û ku jibîrkirina şehîdan çêbibe, nikare mafên xwe bistîne.

Gelê kurd, heta destpêka rizgariya neteweyî li ser şehîdan bi zanistî nesekiniye, şehîd rûmeta xwe hesab nekiriye û di tola wan de nefikiriye. Ji ber vê yekê negihîştîye armanca xwe. Heta vê demê ger ku bi zanebûn li ser tola şehîdan têkoşîn hatibûya dayîn, wê jî koletî û bindestiyê rizgar bûbûya.

Di hemû qonaxên girîng de şehîd hene

Di destpêka tevgera azadiyê de gelek şehîdên bi rûmet hatine dayîn û heta roja îro jî bi hezaran şehîd çêbûne. Jixwe

partiya me li ser riya şehîdan hatiye avakirin. Ji ber vî hawî jî em dibêjin partiya me partiya şehîdan e û heta bîrdoz û siyaseta tevgerê jî di kesên şehîd de bi cih tê...

Bi xwedîderketina li şehîdê yekemîn partî hate damezirandin. Serok dibêje:

"Heta ku heval Heqî şehîd neket damezirandina partiyê nedihat bîra me. Gava ku heval Heqî şehîd ket, me fêhm kir ku tola şehadeta heval Heqî ancax bi damezrandina partiyê tê hilandin. Ji ber vê yekê jî me partî damezirand..."

Pelên daran jî nedihêjiyan. Li hember vê rewşê heval Mazlûm, çaran û şehîdên 14'ê Tîrmehê, bi şehadet û cangoriya xwe pelekî nû di dîroka reş û tarî de vekirin. Ev lehengên hêja ji partî û gel re bûn ronahiyeke mezin. Li hemberî van cangoriyan partiyê dest bi şerê gerîlatiyê kir. 15'ê gelawêjê êrîşek dijwar danî ser dijmin. Piştî heştê û çaran bi şehadeta heval Egîd kongreya sisîyan û pê re ARGK hate damezirandin (1986).

Li vê derê tiştên ku em dixwazin bînin zimên, xwediyê têkoşîna me ya ku heta vê demê hatiye, şehîdên me ne. Dema ku me ji kurdîtiya xwe şermî dikir û dîroka me ser berjêr ber bi windabûnê ve diçû, şehîdên partiyê kirin ku dîroka me ber bi jor bê qulupandin û ji nû ve em li kurdîti û mirovatiya xwe xwedî derkevin. Şehîdên me rûmeta me, nîrxên me, gernas û cangoriyên me ne. Hebûn û têkoşîna partiyê jî lixwedîderketina şehîdan e...

Wexta ku em li ser xwe difikirin, em xwe û partiyê tînin ber hev, li gorî ku partî nîrxê dide şehîdan gelo em çiqas

nîrxê didin şehîdan. Mixabin ku me rûmeta şehîdên xwe baş bizanîbûya, wê karwaniya me jî li gor wesîfeta şehîdên me bûya. Wexta ku me rûmeta dabûya şehîdên xwe, wê jiyana me jî li gorî jiyana û daxwazên wan bûya. Lê mixabin em hîn dîrî jiyana wan û armancên wan in.

Lêxwedîderketin bi gotinan nabe

Di axaftina xwe de peymanî ku em didin, tiştên ku em tînin zimên, girêdana me ya bi şehîdan û bîranîna wan ve ye. Wexta ku behsa şehîdan tê kirin em dibêjin: "Bîranîna wan rêberiyê ji me re dike". Gelo bîranîna şehîdan wê bi çî hawî di dilê me de be? Tenê wê bi gotinan be, ango bi kar û jiyana xwe emê bîranîna şehîdan pêk bînin û em pêk tînin? Bi rastî tiştê ku li ber çavên me ye ne rewşê baş e. Peywira me ya pêşî, divê bi rastî û bi guraî em di jiyana partiyê de bixebitin. Pêwist e ku em karwaniya xwe ya çewt tevî jiyana partiyê nekin.

Serokê tevgera azadiyê, sekinîna me ya li ser şehîdan wiha dinirxîne: "Em barê ew qas şehîdan radikin û em wan temsîl dikin. Mirovê ku hevalê bi hezaran şehîdan be ger ku durist be di cîhanê de, kesî jî wî egîtir çênabe. Heke hûn bizanibin li ser şehîdan rawestin. Pewmanên ku hûn li ser şehîdan didin, nivî ji wan derew in, ne rast in. Li hemberî şehîdan peymanê wiha çawa tê dan? Hûn vê nizanin. Ji vê re hêza we, teqeta we tune ye. Mirovê ku bi bîranîna şehîdan soz bide, vekirî ye ku ew berpirsiya mezin hildigire ser xwe. Ger hûn

van di dilê xwe de bi rastî bijîn û hûn bêjin em bi doza şehîdan ve girêdayî ne, ew hêzeke mezin e. Lê hûn wan zû ji bîr dikin. Di dilê xwe de êş nahewînin. Ger hûn li şehîdan rêz negeirin, hûn li ser şehîdan nasekinin..." Wekî ku serok jî dibêje, ger berpirsiya ku ji me tê xwestin bi şexsiyeteke şoreşgerî û wêlatparêzî me pêk anîbûya, wê demê mayîna me ya li jiyana jî wê bi şoreşgerî bûya. Girêdayîna bi şehîdan ve, bîrdozî, bîr û baweriya neteweyî û çînî ye, girêdayîna bi şehîdan re hêza herî mezin e. Ji bo vê riya serkeftinê jiyana şehîdan e...

Belê, ev tiştên ku em di vê gotarê de nivîsandîye her roj û her gav em tev tînin zimên. Li ber wan ev gotar pir hindik hatiye nivîsandin. Lê belê tiştê me zanîn û baştir zanibin pêwîste ku bi karê xwe, bi jiyana xwe û bi karwaniya xwe em daxwazên wan şehîdên bi rûmet bi cih bînin. Li gelek cîhan niha jiyana şehîdan ji bi kesîtiya partiyê û bi şexsiyeteke leşkerî çêdibe. Ji ber vê jî pêwîst e ku em xwe nû bikin. Gemarî û lewîtdandina ku dijmin dayê kesîtiya me ji ser xwe bavêjin û jiyana û karwaniya şehîdên nemir ji xwe re bingeh bigirin.

Wexta ku em xwe pak bikin, emê zûtir bigihêjin armanca xwe. Riya serkeftinê di bingehgirtina jiyana şehîdan re derbas dibe.

Ger em bandora neyar a ku li ser kesîtiya me ye, em ji ser xwe bavêjin û bi karwaniya xwe em xwe bigihînin jiyana şehîdan, wê demê em dibin layiqî jiyana şehîdan û partiyê.

A. KAHAR AKSOY

25 kewçêr 1996:

Leyla Kaplan çalakiya xwefedayî pêk anî

Gerîlaya Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan ARGK'ê Leyla Kaplan (Rewşen) piştî çalakiya xwefedayî ya Zeynep Kınacı (Zîlan) ya li Dêrsimê, çalakiya xwefedayî ya duyemîn li Edeneyê pêk anî.

Leyla Kaplan 4 roj beriya salvegera damezirandina Komara tirk, di hewşa "Çevik kuveta" Edeneyê bombeyên li ser teqandin, di encama vê teqînê de 3 ji van polîs bi giştî 4 kes hatin kuştin. Piştî vê çalakiyê bi 4 rojan, gerîlaya ARGK'ê Güler Otaç (Bermal) li Sêwazê çalakiyêke bi heman rengî pêk anî.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



30 kewçêr 1985:

Qanatê Kurdo çû ser dilovaniya xwe

Rewşenbîrê kurd Qanatê Kurdo di sala 1909'an de li bajarê Qersê hatiye dinê. Malbata wî di sala 1918'an de koçî Ermenistanê bûye. Xwendina xwe ya pêşîn û navîn li Ermenistanê kuta kiriye. Di sala 1938'an de ji bo xwendina zanîngehê diçe bajarê Lenîngradê û xwendina xwe ya bilind li wir xilas dike. Qanatê Kurdo piştî ku diçe Lenîngradê bi xwendina xwe dibe pisporê zimanên rojhilatî. Rewşenbîrê hêja li fakûlteya ku xwend doktorî û profesorî kir. Li ser çand û zimanê kurdî gelek berhemên wî hene.



Li gorî Verena ew dema wêneyan xêz dike, tu armanca wê tune ye. Verena di xêzên xwe de pênuşa risasî bi kar fîne. Jixwe navê pêşangehê jî "Kara Kalem" e. Bi dîtina wênesaz Verena, wêne xwe bi pênuşa risasî bêhtir diyar dike.

Roja 17'ê kewçêra 1997'an navendeke nû ya hunerê vebû. Ev navenda çandê li ser weşanxaneya Afa bi navê "Afa Sanat Cafe" hate damezrandin. Cafe AFA wê her bi meh pêşangehekê pêşkêşî gel bike. Afa Sanat Cafe pêşangehên wekî, wêne, hunerên plastîk ên destan wê bi gel bi-de nasîn. Her wiha ewê li gorî daxwaz û pêşniyazên xwendevan û weşanxaneyan çalakiyên wekî xwendina pirtûkan, rojên îmzakerîne, danasîna pirtûkan û civînên sohbetê wê bên lidarxistin.

Yekemîn çalakiya Afa Sanat Cafe pêşangeha Verena Ringe-Belik bû. Verena Ringe bi eslê xwe alman e. Pêşangeha wêneyan ya wênesaz Verena bi giştî li ser jinan e. Verena, jin bi awayekî xwezayî fikiriye û ew li ser kaxizan xêz kirine.

Li gorî Verena ew dema wêneyan xêz dike, tu armanca wê tune ye. Verena di xêzên xwe de pênuşa risasî bi kar fîne. Jixwe navê pêşangehê jî "Kara Kalem" e. Bi dîtina wênesaz Verena, wêne xwe bi pênuşa risasî bêhtir diyar dike. Ev pêşangeha ku bi alikariya weşanxaneya Afayê vebûye, pêşangeha wê ya yekemîn e. Verena wêneyên xwe bi gel dide nasîn, heta niha wê tu kes nas nekirîye, ew dixwaze di rojên pêş de wêneyên xwe bêhtir li ser civakê û rastiya gel çêbibe.

Verena di sala 1951'an de li Bonnê hatiye dinê. Piştî bîst saliya xwe li Îngilistanê bi cih bûye. Di sala 1987'an tevî keça xwe û zilmê xwe hatine Stenbolê. Li Stenbolê jî di sala 1990'an Gravûrên xwe li Navenda Çanda Fransî pêşandine. Di sala 1993'yan de wê, xebatên xwe di kargeha wêneyan ya BILSAK'ê de bi alikariya Mehmet Güleriyüz û Sevinç Altan domandine.


Verena, cara yekemîn rojnameyek bi kurdî dibîne.

Piştî ku bihistin em jî rojnameyêke kurdî ne, bêhtir bi me re eleqedar bûn. Verena cara yekemîn rojnameyêke bi kurdî dibîne. Me qala rojnameya xwe Azadiya Welat kir. Wênesaz Verena û alikara wê Sevim Altan piştî nasîna rojnameyê bêhtir kêfxweş bûn. Di berdewama axaftina xwe de wênesaz Sevim Altan sempatiya xwe ya ji bo kurdan anî zimên û da zanîn ku ew xwe nivî wekî kurd nivî jî çermesor (hindiyên xwecihî) dibîne. Her wiha wênesaz Sevim Altan jî di rojên pêş te wê pêşangehekê veke. Wê jî berê xebatên xwe di nav BILSAK'ê de domandin û li wir mamostetî kiriye, lê piştî ku kargeha xwe damezirandîye, ji wir veqetiyaye û niha jî bi serê xwe mamostetiyê dike.

AZAD ZÊRO

ÇAVDÊRÎ

Kongreya Neteweyî



MÎRHEM YÎGÎT

Kongreya Neteweyî êdî ne bi tenê fikrek e, ne bi tenê xwestin û xeyalek e. Dibe rastî û realîte. Hêdî hêdî ava dibe. Xebat û hewlên şoreşê û tevgera rizgarîxwaz ji bo damezrandina Kongreya Neteweyî gav bi gav bi pêş dikevin û êdî divê mirov wê pêşketinê bi rengekî berçavtir, bila şûgevdarî bişopîne, bibîne.

Ji du salan û vir de bi pêşengî û rêberiya Parlamentoya Kurdistanê li Derveyî Welat civîn têne çêkirin, komîte têne avakirin, li ser hewcedarî û pêwistiya Kongreya Neteweyî di televîzyona Medê de program têne çêkirin. Bi gotineke din kerwanê Kongreya Neteweyî ketiye rê, di rê de yê û qonax bi qonax ber bi hedef û roja îlanbûna xwe ve diqedime.

Munaqeshe û lêkolînên li ser Kongreya Neteweyî êdî ji nav hejmarek rêveber û şexsiyetên siyasî derdikeve, dibe dabaşên semîner û civînan. Û ev ne bi tenê li welatekî, belê li gelek welat û bajarên Ewropayê û beşdariyên fireh ji aliyê xelkê ve tê lidarxistin. Di van çalakiyên cur bi cur û germ û gur de guhdar û beşdar roj berî rojekê damezrandina Kongreya Neteweyî dixwazin û bi vê tenê jî nasekinin, neteweyêke bi çil milyonî çawa dikare bêdewlet be dibêjin, diqirin.

Roja 19.10.1997'an li ser Kongreya Neteweyî di bin durîsmê "Kurdino dewleta xwe ava bikin" semînereke çend saetî hate lidarxistin. Di semînerê de ji gelek alî û rêxistinên Kurdistanê beşdar û guhdar hebûn. Rêxistina ERNK, Partiya Serbexoyî Kurdistan, Partiya Komûnîst ya Kurdistanê, du rewşenbîrên kurd Burhan Yasîn û Resûl Hawar axaftinên xwe pêşkêş kirin. Semîner ji aliyê Komeleya Kurdistan Aware ve hatibû organîzekirin ku bi piranî rewşenbîrên başûrê Kurdistanê di nava xwe de kom dike û yek ji çalakiyên komeleyên kurd e li derveyî welat û nemaze li Swêdê. Em dikarin di çend xalan de dîtînin semînardaran wiha bi hejmêrin:

Mesala damezrandina Kongreya Neteweyî ne meseleyêke wiha ye ku em li rêxistinên hene rêxistineke nû yan jî yeke din zêde bikin. Mesele, mesela biryara derketina ji qimên kevn û hatina nav zeman û serdema me ye. Kongreya Neteweyî deriyekî nû, pêl û biryareke nû û jiyaneke nû ye. Kongreya Neteweyî yanî stratejî û projeyêke welatgir, yanî şikandina giş qalib û statûkoya li dijî kurd û Kurdistanê ye. Gava helî cidî û mezin ber bi çareserkirina pirs û pirsgerêkên nav kurdan û aştiya nav xwe ye. Dê kurd bi Kongreya Neteweyî de îspat bikin ku netewe ne, xwe bi xwe dikarin qedara xwe bigirin destê xwe, barê xwe hilgirin, nûnertiya xwe bikin û ji bo vê balixbûnê sitewiyane û temên zaroktiyê li pey xwe hiştine. Kongreya Neteweyî organ û navnîşana hevbeş e. Ji bo ku kurd bibin xwediye organ û platformeke wiha giş faktor û stûnên serekî hene. Di aliyê aborî de, di aliyên siyasî û leşkerî de, di aliyê medya, kulturî û diplomatîkî de û ji awira kadro û tecrûbeyê rêveber û îdarekirinê ve zeman amade ye, îmkan hene û êdî çu sebeb nemane ku Kongreya Neteweyî danemezire, li paş bikeve û bimîne zemanekî din.

Xalekî din ew bû ku bêj hema raya giş semînerdar û beşdaran ew bû ku hin rêxistin û alî hene ji ber ku ne serbixwe ne, bi derve ve, bi filan û bêvan dewletê ve girêdayî ne, her çendî bi gotin nebêjin jî li dijî Kongreya Neteweyî ne û ev jî ne sebeb e ku ev-gava çarenûsa kurdan pê ve girêdayî ye û ew çendî girîng û dîrokî ye hinekî din-bisekine.

Rojnameger Celal Başlangıç

Medya nikare ji dewletê



Wekî hûn ji dizanin, agahiyên objektîf ji aliyê çapemeniyê ve nayên nivîsîn, çima?

■ Di hîmê medyaya pawankaran (tekelci) de bêguman piştigiriya dewletê heye. Ji ber vê yekê medya bi şeweyekî xurt, bi dewletê ve girêdayî ye. Jixwe ji aliyê ramanê ve jî, patronên medyayê di bin bandora bîrdoza fermî de ne. Nikarin ji dewletê cuda bifikirin.

Dema kêşeya kurd kete rojevê dirûtiya medyayê derkete holê. Nûçe li ser agahiyên ku ji saziyên fermî dihatin çêdibin. Di vê heyama ku em tê de dijîn de, bi taybetî jî ji sala 1984'an û vir de em rojnamevanên ku bi telefoneke serkaniya giştî ji kar hatine avêtin dizanin. Di nav rêveberiyê de bi vî rengî de em nikarin ji medyayê tiştekî hevî bikin. Em nikarin li ser kêşeya kurd ji nûçeyên objektîf jê hevî bikin. Lê heger pir bi pêş de herin, dê li ser zarokên Culemergê yên ku ji ser tingê (çop) xurekê ber hev

dikin, binivîsîn.

Tê gotin ku medya heza çaremîn e. Hin caran medya tirk wekî heza yekemîn tevdi gere, hûn vê helwestê çawa dinixînin?

■ Bele berî her tiştî, ez di heyama îroyîn de medyayê wekî hezeke zêde cidî nabînim. Medyaya çepgir ne di navê nixandinê de ye.

Yên bazara aboriyê xistine destê xwe, yanî yên ku ji sedî 70 an 80'yî ve bazarê di destê xwe de digirin du pawan in. Ew manşet û nivîs, bi gotin an jî fermî hin hêzên din tînin nivîsandin. Ji ber vê yekê di babeta şer de ku xaleke krîtîk e, mirov nikare wê wekî heza çaremîn jî bi nav bike. Peywira xwe ya heza çaremîn di derxistina zagona trafikê de bi cih tîne.

Ji bo zimanê rojnamegeriyê gelo tu pirsgirêk derketine pêşberî we?

Niha belgeyê veşarî ya wezareta karê derva kete destê re hatiye pêşkêşkirin. Di raporê de; Hetanî ku em bi Eranî qanunî em kîjan qanûnan neguherînin dibêje. Dîsa di wî divê bê

■ Dema ku ez di rojnameyê de berpîrsê karên nivîsaran bûm, min wê demê jî kirinên dewletê rexne dikirin, dema leşkerek dihat kuştin şehîd dihat nivîsîn, polis dihat kuştin şehîd dihat nivîsîn, PKK'yî dihat kuştin bi mirîfî bi dest ket, digotin, kî çawa dixwaze bila wisa binivîsîne, lê di nûçeyê de, nûçeyê ku divê objektîf be, de divê ne bi vî rengî be.

Min ev yek demê jî holê rakir, min gerîndeyê weşanê qanî kiribû. Lê piştî wê bi mehekê gerîndeyê weşanê hat û got: Divê leşker şehîd, polis şehîd û PKK'yî jî mirî ketin dest, bê nivîsîn. Min got çima, wî jî bersiva min da; divê em guh bidin hin telkînan. Her wiha wan jî guhên xwe bel kirine û guh didin wan telkînan.

Ji bilî artêşa tirk, hezeke din ku medyayê bi kar tîne, heye? Mînak: bandora sermayedaran li ser medyayê heye an na?

■ Divê li vir em tiştekî ji hev veqetînin: Burjûwazî û dewleta kûr car caran li hev nakin. Dewleta kûr ya ku di destê leşkeran de ye hin caran dibêje: "Tu ji sînor derbas dibe Sakıp Axa" û piştî ku kuştina Özdemiş Sabancı, rapora ku li ser navê "Güneydoğu Raporu" ji aliyê TÜSIAD ve hatibû nivîsîn tê de qala azadiya ramanê dihat kirin, vê dubendiyê nîşan didin. Lê dema ku di navbera serkaniya giştî û sermayeyê de tu pirsgirêk nînin bin medyaya pawankaran giraniyê dide dîtin, raman û gotinên sermayeya pawankar.

Hûn rewşa "burjûwaziyê demokrat" yanî demokrasiya burjûwaziya Tirkiyeyê çawa dinixînin? Demokrasiya burjûva li Tirkiyeyê heye an na?

■ Şert û mercên wê yekê nînin in. Ava kirina şertên demokrasiya burjûva bi destên kedkar, karker û rewşenbîran pêk tê. Lewre ev bar li ser milê wan e. Em nikarin bibêjin demokrasiya burjûvayê me gihîştîyê wê aste.

Burjûwaziyê me di tu mijaran de bi ser neketiye û mirov nikare bibêje bi rêxistin e jî. Lê burjûwaziyê Tirkiyeyê jî ber şer di ziyaneke mezîn de ye. Hinekên ku sûdê jî şer digirin hene; ên ku çeka difiroşin û yên ku konsorsiyûma ava dikin û tiştan difiroşin dewletê hene. Lê li derveyî wê komê burjûwazî yên ku zi-

yanê dibînin jî hene.

Ji ber çî?

■ Ji ber ku li Tirkiyeyê yekîtiya bazarê xera bûye. Bifikre ku li Tirkiyeyê salê nêzikî katrilyonek ji bo şer tê xerc kirin. Ew pere wê ji bo burjûwazî bibe krêdî û lê vegere. Burjûwazî hesabê wê yekê dike. Ji ber ku burjûwazî bi giştî ji şer rantê wernagire li dijî şer derdikeve.

Hûn di vî warî de marksîstan çawa dinixînin?

■ Belê yên ku bi awayekî tund li ser wê yekê xebatê dikin, hene. Lê ev hewlên ji bo guhartina sîstemê bi awayekî têr piştigiriya gel nastînin û qels dimînin. Ji bo wê yekê hinek dem divê. Ev yek wê bi tenê dijbertiya sîstemê û pê re şerkirinê pêk bê.

Rewşenbîr û demokratên ku li dijî kirinên dewletê radiwestin, ne xwedî raye ne. Li Ewrûpayê her çiqas vê rastiya dewletê tînin zimên jî, gotina dewletê bi ser ya wan dikeve, hûn vê yekê çawa dinixînin?

■ Ez wiha bibêjim. Niha di destê dewletê de hin koz hene. Her çiqas Mesut Yılmaz here Ewrûpayê ba Helmut Koln kêşeya kurd, yanî rêxisteya kurd nas neke û ya xwe biparêze jî di nav girseyeya demokrat ya Ewrûpayê de roj bi roj çeper lê teng dibe. Mînak; di hilbijartinan de qala helwestgirtinê dike. Ev rewş Tirkiyeyê dixê zorê. Ez ne bawer im ku der heqê kirinên Tirkiyeyê de agahî bi rêkûpêkî digihîjin Ewrûpayê. Ez dibêjim pirsgirêka herî mezîn bi gelê tirk re ye, ji ber ku gelê tirk tenegehîştîye ku pirsgirêka xwe xwedîkirinê, pirsgirêka wî bi xwe ye.

Gelo hevdiatina Yılmaz û Koln nîşana avêtina hin gava e, derxistina xalên li

Lê di bin wê de parantêzek naxa ku em li dijî terorê teo guhartina vê qanûnê Ligel van yekan xuya dike yê hatine girêdan. Hetanî tu rakim. Tiştêk di destê Yılmaz biryarê

çûda bifikire

in. Ev rapor ji aliyê dîplomatên karê derve ve ji hikûmê payê re di wateya fikirîna azad li hev bikin, bi şeweyê diyar dike ku qanûna têkoşîna bi terorê re benda 8'an martî.

ser kêşeya kurd ji ber çi bû?

■ Belê nişana gavavêtinê ye. Ji roja ku şer dest pê kiriye li Tirkiyeyê baweriyek daye Ewrûpayê. Di Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewrûpayê de nêzîkî sed hezar baweriyaya Tirkiyeyê heye. Ya herî hêsan qanûna "Memurî Muhakemiyat" soza wê di sala 1989'an de hatiye dayîn.

Her wiha ji aliyê dîplomatîk ve wekî her kesî ew jî dikare wê beşa kêşeya kurd ji protokolê derxe, lê ji ber ku derxistiyê bi awayekî tund dibê ku bê rexnekirin. Li aliyê din bi derxistina wê beşê kêşeya kurd ji holê ranabe.

Niha belgeyê weşarî ya wezaretê karê derva kete destê min. Ev rapor ji aliyê dîplomatên karê derve ve ji hikûmetê re hatiye pêşkêşkirin. Di raporê de; Hetanî ku em bi Ewrûpayê re di wateya fikirîna azad li hev bikin, bi şeweyê qanûnî em kîjan qanûnan neguherînin dibêje. Dîsa di wir de diyar dike ku qanûna têkoşîna bi terorê re benda 8'an divê bê guhartin. Lê di bin wê de parantêzek hatiye vekirin û dinivîse, Di qonaxa ku em li dijî terorê têdikoşin de, serkaniya giştî li dijî guhartina wê qanûnê ye û paratêz tê girtin. Ligel van yekan xuya dike ku ji ber çi egeran destê Tirkiyeyê hatine girêdan. Hetanî tu bêjî bes, bila Yılmaz bibêje ezê rakim. Tiştê di destê Yılmaz de nîn e, dewleteke kûr heye, biryaran ew dide.

Susurluk xaleke girîng e. Em bibêjin medyayê giraniya xwe daye ser wê bûyerê. Wan malzemeyên di destê xwe de çawa dikare bi kar bîne?

■ Bi tenê ew qas malzeme dabûn çapemeniyê, wan jî ji wê pêştir tiştêk nenişî. Yanî medyayê jî ber xwe tiştêk derxist. Bi destê wan li medyayê hate belavkirin. Hetanî tîkiliyên Çillerê bi çeteyan re bi kar anîn, bi taybetî wekî bûyera Ömer Lütfü Topal, yanî anîne wê wateyê ku, çete ji ber berjewendiyên şexsî hatine afirandin. Ev çete tîkîlî politîkaya dewletê hatine bikaranîn, bi taktîka şerê taybet hatine bikaranîn û wan jî ji şerê taybet sîde wergirtine.

Heta niha qet nûçeyên we hatine sansûrkin, heke hatibin sansûrkin li ser çi bûn. Bi kîjan mijarê ve eleqedar bûn nivîsên we?

■ Belê berê hebûn lê rojnameya ku ez vêgavê tê de xebatê dikim nehatin sansûrkin. Lê nûçeyên ku di der barê leşkerên ku PKK'yîyan revandibûn çend nivîsên kirîfik nehatine weşandin. Piştî ku ew leşker hatin berdan, gelek tişt hatin serê wan. Piştî re dîsa hatin revandin û hwd. Tiştê ku bi serê wan de hatibû min nivîsandibû. Her wiha wê demê qala çerbeya leşkerî dihate kirin. Gerîndeyê weşanê got, em nikarin van nivîsan di wê demê de biweşînin.

Hûn bi salan di rojnameya Cumhuriyetê de xebitîn, hûn xêza wê ya der barê kêşa kurd de çawa dinirxînin?

■ Min ji ber wê yekê îstifa kir. Ez bîpîrsê karên nivîsaran bûm. Cumhuriyet kêşeya kurd nabîne. Ji xeynî çend nivîskaran. Yanî di nava çepgirîyan de baweriyaya serkaniya giştî bi cih bûye.

Hûn hiç çûne herêma Behra Reş?

■ Ez neçûm, lê hevalên ku çûne wê derê, ez bi wan re axivim. Ka çi ye ev? Ji xwe PKK nîn e li wê derê, gerîla ne mimkûne ku karibe li wan çiyayan bijîn. Lê dewletê ji vêga ve dest avête wê derê. Wê kî gerilayan weşêre, kî xwarinê bide wan, wê ew çawa xwe xwedî bikin. Îro çima gundên Başûrê Rojhilat vîla dikin, nizanîm di şerê de li dijî gerîla ev taktîkeke vekirî heye. Çi ye, gerîla masiye û gel jî derya ye. Çi pêwîst e, divê ava akvaryumê bê valakirin. Divê akvaryumê de av nîn e.

Bahoza ku li ser wê yekê rakirin hûn çawa dinirxînin?

■ Ranta şerê Başûrê Rojhilat hindik hat. Divê hin sahayên din vebin. Her roj nanek ji ber wî şerî jî zikê wî gelî kêmbibe. Pêvajoya belengaziye bi şiklekî derbas dibû, lê vêga ne wisa ye. Şertên şerê taybet hene. Rojavaya Tirkiyeyê jî êdî di bin bandora wî şerî de dimîne. Ji ber wê yekê divê em aştiyê bi gelê tirk bidin



fêhmîkirin.

Di sohbetekê de Coşkun Aral digot ku wê rojekê medyaya Tirkiyeyê bi ser xwe ve were û wî şerî bisekinîne. Tiştêkî bi wî rengî pêkan e?

■ Ez ne bawer im ku tiştêkî wisa pêk were. Heger rojekê serkaniya giştî aştiyê bixwaze, medya dikare lehiyê jî û bahoze jî rake.

Serkaniya giştî bangî we dike çar çaran...

■ Na bangî min nakin, lê ez texmîn dikim ku bangî gerîndeyê giştî yê rojnameya min kirine, ew serwest kirine (biken), hêviya xwe ji min birîne.

Çapemenî li bûyera Metin Göktepe xwedî derket. Di ser sîhî re rojnamevanên kurd hatin kuştin, çapemeniyê çavên xwe jê re girtin, çima?

■ Beriya her tiştî Metin li Stenbolê hate kuştin. Sedema duyemîn rojnamevan bû, her çiqas hin fikrên wî yên dijber hebûn jî, ew rojnamevan bû. Sedema sêyemîn (bi dîtina min) sedema herî ya girîng e, Metin di rojnameyê de kurdan de nedixebitî. Ev sedem herî girîng e.

Rojnamevanên ku ji Stenbolê jî hatine revandin û kuştin hene?

■ Belê heger Metin ji rojnameya Demokrasiyê derketibûya û bihata revandin, wê yekê ev qas deng venedida.

Işık Yurtçu ne kurd e, lê di rojnameyê de kurdan de dixebitî, ji serokwezîr

bigire, hetanî serokomar li meseleyê xwedî derketin, hûn wê yekê çawa dinirxînin?

■ Ji bo ku xwe li dijî Ewrûpayê paqij nişan bidin, wisa kirin. Bavê Yurtçu rojnamevan bû. Bingeha rojnamevaniya Yurtçu ne rojnameya kurdan e, Yurtçu berî wê di gelek rojnameyan de kar kiriye.

Di cihanê de rojnamevanên herî zêde tên kuştin kurd in. Sedema wê yekê çi ye?

■ Ew di şertên giran de rojnamevaniyê dikin. Ez naxwazim rojnamevanên kurd û tirk ji hev veqetînim. Rojnamevanî û siyasatmedarî ya li dijî sistemê karekî dijwar e.

Hûn rewşa tevgera çepgir a legal çawa dibînin?

■ Niha belawela xuya dike. Ez ne bawer im ku ÖDP bi serê xwe karibe wê potansiyelê berhev bike. Ji ber wê yekê divê HADEP û ÖDP bi hev re tevbigirin. Pêwîstiya çepgirîyan bi hevkarîyê heye.

Li gorî we têkoşîna PKK'ê ya 15 salan, çi guherîn di hiş û dilê kurdan çêkir?

■ Beriye her tiştî di navbera 15 salan de di warê netewebûnê gavên mezin hatin avêtin. Mirovan xwe naskirin. Lê tiştê ku min gelekî xemgîn dike, ev 15 salî ne ku bi hezaran gund hatin valakirin, bi hezaran mirov hatin kuştin. Ev yek min gelekî diêşîne.

Metelok û gotinên pêşiyên cewhera huner û jiyana gel in

Şoreşger, zanyar, leşker an jî hunermend û wêjevan ji bo ku karibin rista (rol) xwe bilîzin, pêwîst e ku gelê xwe û mirovahiyê nas bikin. Naskirin; zanebûna dîrokê ye, zanebûna xisûsiyeta civakê ye. Bi rastî ev agahî û xisûsiyet, herî zêde di zargotîna (folklor) gel de tene dîtin. Ango çîrok, destan, methelok û gotinên pêşiyên gel û civakê rind didin nasîn. Wekî ku Maksîm Gorkî jî gotiye: "Ramana girseyan bi awayekî herî fêrdar û bêkêmasî metelok û gotinên pêşiyên didin xuyakirin."

Metelok û gotinên pêşiyên, tecrûbeyên mirov û xebatkaran bi kurtasî finin zimên. Jiyana gel, wekî neynikê bi rengekî vekirî radixin ber çavan. Ango xisûsiyet û nêrînen gel û çînen pêşverû an jî paşverû, yê idealîst, an jî materyalîst bi şeweyekî rasteqînî finin zimên. Ev jî wekî ku tê zanîn azîneya materyalîzmê bi xwe ye.

Hunera gel di metelok û gotinên pêşiyên de berbiçav dibe. Di hinek bêjevan de gelek raman tene îfadekirin. Ji bo vê yekê, metelok û gotinên pêşiyên, kaniya hozan, hunermend, wêjevan, milîtanê partiyê û leşkeran in. Çimkî, "kurtbûn xwîşka serfiraziyê ye" (Anton P. Çexov) Mirovek çiqas zêde metelok û gotinên pêşiyên zanibe, ew qas dikare axaftin û nivîsandina xwe bi kurtahî bike. Lê her mirov li gorî hêza xwe dikare wî karî bike.

Metelok û gotinên pêşiyên koka giyana gel in. Mirovê ku xwe negihîne vê kokê, çi bike, nabe welatparêz û şoreşgerê rasteqîn. Mirovê ku bixwazin raman û nêrina xwe bi pêş ve bibin, divê vê yekê hîn bibin. Xisûsiyeteke mirovên mezin jî ev e. Wekî mînak Mao, di zarokatiya xwe de gelek metelokên gelê xwe rave dikirin. Bi hêza wan metelokan, di gotûbêjan de zora bavê xwe û yê din dibir. Mao her car çanda gel ji xwe re rêber didît. Bi piranî jî metelokên gelê xwe, gelê Çînê. Bi kurtasî, di afirandina keşayetiya Mao de, rista metelokan girîng e. Wêjevanê mezin û pêşengê wêjeva sosyalîst û rasteqîn Maksîm Gorkî wiha dibêje: "Ez jî metelok û gotinên pêşiyên hîni pir tiştan bûm. Ramanên ku dijîn, tiştên ku di hînbûna hizirî û nivîsandinê de ji min re alîkarî kirin, ew bi xwe bûn"

Dewlemendiya çanda gelê me herî zêde di zargotînê de xuya dibe. Gelek wêjevan û lêkolîner vê rastiyê finin zimên. Yek ji van jî Dr. Ordixanê Celîl e. Celîl wiha dibêje: "Li Rojhilata Navîn, di warê wêjeva devkî de çanda tu gelî wekî ya me kurdan ne dewlemend e."

Metelok û gotinên pêşiyên, tecrûbeyên mirov û xebatkaran bi kurtasî finin zimên. Jiyana gel, wekî neynikê bi rengekî vekirî radixin ber çavan. Ango xisûsiyet û nêrînen gel û çînen pêşverû an jî paşverû, yê idealîst, an jî materyalîst bi şeweyekî rasteqînî finin zimên. Ev jî wekî ku tê zanîn azîneya materyalîzmê bi xwe ye.

(Yênî Ülke, 4-10 kewçêr 1992)

Wekî ku tê zanîn metelok û gotinên pêşiyên me, di wêjeva devkî ya gelê kurd de risteke girîng dilîzin û dewlemendiya zimanê kurdî didin xuyakirin. Wêje û hunera neteweyî û proleterya çiqas li ser vê kokê werê afirandin, ew qas dikare rola xwe bilîze û berhemên mezin bide afirandin.

Zagonên jiyân, leşkerî, siyaset, rêz û rêçik di metelok û gotinên pêşiyên de bi awayekî kurt tene zimên. "Hûr bajo, kûr bajo, zû bajo, lê ga neêşîne" terz û leza zanistî dide ber me. "Dara azadiyê bi xwîn û xwêdanê tê avdan" dide xuyakirin ku azadî û serxwebûn bi ked û şer tê afirandin. "Qurmê reş, agirê geş"

girîngiya gewher û bîrdoziyê, ango girîngiya girêdana dozê tîne ziman. "Mêrê çê, bi lepê xwe ye." û "Ên bi hespê xelkê tim peya ne" girîngiya hêz angî çî û partiyê didin xuyakirin. "Li rû binêre, mirovê xwe nas bike", qaîdeyê zanista psikolojiyê ye. "Xuyê şîrî, heta pîrî" hîndari û zorbûna guhartina hîndariyan dide xuyakirin û hwd.

Şoreşger û nivîskarê mezin ew e ku di axaftin û nivîsîn xwe de metelok û gotinên pêşiyên bi kar tîne. Dema ku mirov ramana xwe bi van navgînan bixemilîne, fêdeyên wê pir in. Yek; raman balkêş dibe. Dido; mirovan nêzîkî koka xwe dibe. Ev girîng e, çimkî "her giya li ser koka xwe şîrî tî." Sisê; têgi-

hiştina ramanê hêsan dibe û di aqilê mirov de dihele. Nemaze, ji bo gelên bindest ên wekî gelê me ku xwendin û nivîsandina wan pir kême, ev rewş hê zêdetir girîng e. Gelên wilo, ji metelok û gotinên pêşiyên bêhtir fêhm dikin.

Ji bo wan rastiya metelok û gotinên pêşiyên girîng in. Gewhera zanîne, huner û wêjeva gel e. Gel hunermend û zanyarê herî mezin e. Divê em jî afirandinê gelê xwe hîn bibin. Divê em van nîrxên pir hêja ji dijmin biparêzin. Parastin û lîxwedîderketina mezin, hînbûn, berhevkerin û bikaranîna wan e. Dijmin ji bo ku bi nîrxên wiha dizane, ji sala 1930'î heta îro wan ji nav gelê me berhev dibe, werdigerîne zimanê xwe û wekî yê xwe dide nîşan. Ango, dizîya çanda me dibe. Gelo li dijî vê me çi kiriye? Bi rastî heta ku partiya me derneket holê, haya gelê me ji van nîrxan tunebû. Piştî têkoşîn û şerê partiyê, gelê me jî li nîrx û çanda xwe xwedî derdikeve, lê ev yek nehatiye merhela-yeke baş.

Wekî ku tê zanîn şehîd Huseyin Deniz, di vê mijarê de pirtûkek nivîsandibû. Çend gotarên wî jî hatin weşandin. Car caran di Azadiya welat û Jiyana Rewşen de jî hinek metelok û gotinên pêşiyên tene weşandin. Û em zanin ku xebatên din jî hene û berdeham dikin. Ev hemû pêşketin in, lê ne bes in. Nexasim, mirovê ku dibêje ez nivîskar im, hunermend im, wêjevan im, şoreşger im, divê ji vê kaniyê ava zelal û pak vexwe.

Di vê mijarê de pêşniyareke me jî heye. Heger em metelok û gotinên pêşiyên xwe, li gora mijaran ji hev veqetînin. Paşê jî wan mîna metelok û gotinên pêşiyên ên li ser leşkeriyê, li ser kedê, li ser şeweyê, li ser welat-welatparêziyê, îxanetê û hwd. biweşînin, wê baştir bibin. Dema ku bi vî awayî hatin veqetandin lêkolîner, şoreşger û hwd. bi hêsanî ji bo axaftin û nivîsîn xwe dikarin ji wan îstîfade bikin.

Bêguman metelok û gotinên pêşiyên dewlemendiyan mezin in; ev nîrxên gelê me, gewhera jiyane ne. Gewhera zanîn, huner û wêjeva gel in. Divê em li wan xwedî derkevin, di jiyân û nivîsandinê xwe de wan bi kar bînin.

MAHMUT YILDIZ-HUSEYIN TURGAY



Li NÇM'ya Stenbolê
25.10.1997 Şemî

Govenda Koma Serhildan. Koma serhildan di sala 1991'ê de ji aliyê yazdeh kesan ve hatiye avakirin. Piştî ku NÇM vebûye, di nav xebatên NÇM'ê de cih girîfîye. Saet: 14:00

Konsera Koma Agirê Jiyân

Koma Agirê Jiyân ji destpêka NÇM'ê heta îro xebatên xwe didomîne. Heta niha kasetek bi navê "Adarê" derxistîne, Niha jî amadehiya kasetê xwe ya duyemîn dike.

Çalakiyên vê hefteyê



26.10.1997 Yekşem.

Panel: "Pirsgirêkên perwerdehiyê", panelîst: Dursun Yıldız, saet: 14:00

Konsera Koma Rojhilat: vê komê jî di destpêka NÇM'ê de bi dest bi xebatên xwe kirîye. Heta niha kasetê wan derneketîye. Rojên pêşîya me bi navê Mezrabotan kaseteke wan a yekemîn derkeve, saet: 17:30

29.10.1997 Çarşem:

Semîner: Îsmail Göldaş, "Komara Alternatîf", saet: 18:00

Gelê kurd ji temsîlkirina gelên mazlûm moralê distîne

Li gorî daxuyaniya Haluk Gerger gelê tirk di şerê qirêjî yê ku ji aliyê dewleta tirk ve tê meşandin de têk diçe. Gerger diyar dike ku gelê kurd dibe nûnerê gelê mazlûm û ji vê yekê moralê distîne, lê gelê tirk ji layê moralê ve têk diçe.



Roja Yekşemê 18.10.1997'an de li Navenda Çanda Mezopotamyayê panelêk bi sernavê "Li Tirkîyeyê Qeyran" hate lidarxistin. Axivgerê vê panelê Haluk Gerger bû. Haluk Gerger di panelê de li ser rewşa siyasî ya îroyîn a Tirkîyeyê rawestîya. Tevî wê yekê li ser sosyalîstên Tirkîyeyê û li ser burjûwazî hin dîtin û ramanên xwe pêşkêşî beşdarên kirin.

Gerger di destpêka axaftina xwe de daxuyand ku tevî qeyrana (krîz) sistemê sosyalîstên Tirkîyeyê jî di qeyranê de ne. Yanê alternatîfa kapîtalîzmê, tevgera sosyalîst jî di nava qeyranê de ye.

Li gorî nivîskar Haluk Gerger sistema Tirkîyeyê di sêgoşeya tirs û qeyranê de dimeşe. Ji ber vê yekê, nijadperestîya tirk derketîye holê.

Gerger dadixuyîne ku rewşa burjûwaziyê tirk ne asayî ye. Çîna ku şoreşa burjûwazî a demokrat pêk anîne hene. Lê ev burjûwaziyê tirk, li hemberî jiyânê di nava nakokiyên kûr de dijî û ji rastiyên jiyânê ditirse.

Her wiha Gerger di dîmahîka axaftina xwe de diyar kir ku, ewlekariya neteweyî di nav dewletên kapîtalîst de, demokrasiya şerê sar e. Li Tirkîyeyê diya pirsgirêkan, kêşeya kurd e. Tirkîye ji zordariyê pêştir çareseriyê nas nake. Gerger diyar dike ku, jixwe Tirkî-

ye ketîye nav kûr û di binê vê birê de dijî. Her wiha Haluk Gerger dide zanîn ku şerê qirêjî her kesî dirizîne.

Gerger di berdeyamê axaftina xwe de li ser aboriya Tirkîyeyê jî wiha axivî: "Aboriya Tirkîyeyê li ber topavêtinê ye. Nêzikî 80 milyar dolarî deynê Tirkîyeyê yê derveyî welat heye." Li gorî nivîskar Gerger arizkirina (özelleştirme) saziyên dewletê bi xwe re ji holê rakirina Tirkîyeyê tîne.

Li gorî daxuyaniya Haluk Gerger gelê tirk di şerê qirêjî yê ku ji aliyê dewleta tirk ve tê meşandin de têk diçe. Gerger diyar dike ku gelê kurd dibe nûnerên gelên mazlûm û ji vê yekê moralê distîne, lê gelê tirk ji layê moralê ve têk diçe.


Di panelê de nivîskar Gerger li ser pirsgirêkên sosyalîstên Tirkîyeyê de jî rawestîya. Li gorî nivîskar Gerger du meylên sereke di nav sosyalîstên Tirkîyeyê balê dikişînin. Li gorî Gerger yek jê di bin bandora sendroma bi navê "welat ji dest diçe" ye. Ya duyemîn jî helwestê li dijî fundemantalîzm û paşverûtîya ereban nîşan dide. Gerger dadixuyîne ku ev meyl lawaz e. Gerger diyar dike ku, divê ev hez bi hev re îttîfaqê bikin, lê ew diçe bi kemalîstan re îttîfaqê dike.

Her wiha nivîskar Gerger di dawîya axaftina xwe de diyar dike ku, dema dewlet derbarê kêşaya kurd de helwesteke tûj negire, sosyalîstên Tirkîyeyê dikevin nav qeyraneke mezin. Her wiha divê di navbera gelê kurd û kedkarên tirk de îttîfaqê stratejîk pêk bê.

A. AVAŞIN

TÎŞK

Nûşttoxê ma qandê
neweşîna xo, nêşa no
hefte niwisê xo binuso.



LERZAN JANDÎL

Kî me ez?

Kurdê Kurdistan
Tev şoreş û volqan
Tev dînamît im,
Agir û pêt im.

Sor im wek etûn,
Agir giha qepsûn
Gava biteqim
Dinya diheje.

Ev pêt û agir
Dijmin dike
Kî me ez?
Ez rojhilat
Tev birc û kelat,
Tev bajar û gund
Tev zinar û lat
Ez xweş mirov im,

Ne hirç û hov im!
Lê çî bikim bêşer
Dijmin naçe der,
Bav û kalê min
Dijîn tev serbest
Naxwazim bijîm
Ta ebed bîndest
Kî me ez?

Baweriya me ya bi rojên azad û serbixwe bi berxwedan û keda we ya bêhempa tîrêjên ronî didin welatên rojê.

Em li ser navê hemû şehîdên şoreşê wî û çar hevalên wî, bi bîr tînin.

Li ser navê malbata wî
Xwişka wî Behiya Yaş

Werin!

Em bi Ferêt re govendê bigirin
Li ser zimanê me stranên Newala Çorî... Beşdarîya we di şahîya vebûna Navenda Çanda Mezopotamya, şaxa Rihayê de hêzeke mezin bide me.

Dem: 25 Kewçer 1997

Şemî Saet: 14:00

Navnîşan: Sarayönü cad:
Yetkin İşhanı Kat: 4 Urfa

Ferhenga kurdî amade dibe
Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê xebata xwe ya li ser ferhenga **Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî** didomîne. Werin bi peyvên xwe yê herêmî ferhenga xwe dewlementir bikin.

Navnîşan: Atatürk Bulvarı
Ceylan Palas Apt.

No: 152/12 Aksaray/İstanbul

Tel: 527 19 11

Fax: 527 61 49

Destana Tahir û Zahirê... (2)

Roj û şev ji bo Zahirê ketin nav hev. Ev serê çardeh salan e ku roj û şev, gav û saet her dem bi hev re derbas kiribûn. Lê, îro Ereba Xoce felek li wan gerandibû. Êdî, Zahirê jana dilê xwe bi stranan dirijand:

*Lê de bibê bibê, lê Zahirê bibê
Siwarê bozê Xocê Xizir hatî piştî qubê
Bila li min û Tahir derkeve stêra sibê
Ji vî derdî ez namînim, bila bê dawîya dinê.*

*Lo de banî banî, lo de Tahiro banî
Xwedê vê sibehê ji min û te re xerab anî
Hêstirên Zahirê diherikin weke çem û kani
Li nava heşt hezar kesên bajarê Palo de
Xwedê taala ji min û Tahirê min re xerab anî
Tahiro ez bi qurban tu kevoka sekman î
Gava germa havînê li me danî
Lê Zahirê dinê tu va yî Tahir kani?
Lo de dilo ez nemînim Tahir kani?*

*Lê de nabe nabe, lê Zahirê nabe
Xwedê jî bi vî rewşê dixeyide, razî nabe Ji
ber kirinên fesadan
Xwedêyo dilîni nabe
Ger xwedê mirazê min bi dilê'm neke
Bila di dar de ke*

*Lo de banî banî, lo de Tahir banî
Xwedanê jor îro ji me re xerez anî
Bila Xwedê kul' bike mala mîr û Xocê Ereba
çawa ketin navbeyna her du dilan Îro evîn
nefî bûye, dil jî hev veqetiyane
Lo de birin birin Zahirê birin
Mala Tahirê'm îro ji bajarê Palo bar dikirin.
Berê wî dan bajarê Mûsilê, lo em ji hev kirin*

*Bajarê Mûsil bişewite ne havîn e, ne bihar e
Tahiro ez bi qurban bajarê Mûsil ji te re ne
tu war e Destê min evdalê ji te nabe, roj
germ e, bi şev sar e
Gotinên Xocê Xizir siwarê bozê ji me re bê
qerar e
Tahiro, delalê dilê min tu dîsa kerem ke were
mal e
Ezê cilên delalê xwe bişom li eywanê bi avên
germ û sar e
Emê dîsa dest biavêjin hev, bikin wan henek
û yar e
Seba Tahirê minî delalê dî min ne kar û ne
emel e
Karê dinê bi min zor e, dilê min bi jan û
keser e. Jîna min li bajarê Palo, seba tunîna
Tahir bi min giran e*

*Xwedêyo mirin heba dil tuneba
Xwezî dîsa mala me cîranê mala we ba
Diwarê navbeyna me herduwan xera biba
Sibehê, êvarî çavên min bi bejna te ba
Ezraîlê'm li ser milê min peya biba
Emrê min çiqas heba, mirina min li beriya te
ba.*

*Zahir, nameyek tîjî ji hêstirên çavan
dîvîstine. Çavên xwe li ser rîyan û dirban
digerîne.
Karwanê Mûsilê tê dîhere ku name pê re ji
Tahir re bişîne.
Zahirê bala xwe daye, karwanê Mûsilê ji wê
de tê ye
Name ya xwe girte û xwe da keviya rê ye.*

*Bala xwe daye sermiyanê karwan teftîş da
xelkê ye
Serbazirgan siwarê hespekî çê ye
Zahirê li dora karwan dîhere û tê ye
Ez keçik im.
Ger ez name bidim ditirsim wê navê min
xerab bê ye
Cardin name kir
paşila xwe û veqeriyê
qonaxa qesrê ye
Karwana Mûsilê hat û zivirî kete rê ye*

*Tahir ez bi qurban Mûsil bişewite mîwên
tîrî.
Min qonax bir perê cehdê lê rê çêkirî.
Bi çavên şilûg, derdekî mezin nayê nivîskirî
Bila li dilê te eyan be ku min çima name
neşandiye
Karwana Mûsilê hat û ji min bihurî
Zahirê li hundirê qesrê û qonaxê digirî, dîhere
û tê ye. Bala xwe didiyê ku serê qantirêkî
derket ji hêla rê ye.
Feqîrêkî li siwarê qantirê dimeşin li serê rê
ye*

*Zahirê got: Ya rebbe îzzetê, ev mizgîna çûyî-
na nameyê ye.
Zahirê, name hilanî û xwe da perê cehdê
keviya rê ye.
Got: Qantirçiyê ez ketime bextê te û Xwedê
ye
Gelo tu yê berê xwe bidî ku û herî kê derê
ye?*

*Got: Lê xwengê ez dikim herim bajarê
Mûsilê ye.
Zahirê got: Zilamekê min heye li bajarê
Mûsilê ye.
Ez dixwazim nameyek jê re bişînim.
Ne qaçax e, weke sîrrê dewletê ye
Qantirçî got: Lê xwengê, Xwedê li kesî neke
kirasê feqîriyê
Zahirê, destê xwe li paşila xwe digerîne
Sed û pîncî zêran heqê qantirçî dertîne
Qantirçî çer ku zêran dibîne, ez nemînim
çawan dilezîne.
Qantira xwe dibe li mezatê difroşe, hespekî
çê distîne.
Nameya Zahirê li beriya xwe datîne.
Dibêje: Lê xwengê, navûnişana xwediyê
nameyê kî ye?*

*Zahirê dibêje:
Lô de yan e yan e, lo de dilê'm yan e. Dêrdê
min ji alî Xwedê ve pir giran e.
Ne îlac û ne hekîm û ne derman e
Gava tu gihayî bajarê Mûsilê bi ferman e
Ji cîwanên bajarê Mûsilê bipirse
Gelo qonaxa Tahir kan î?
Hema, qantirçî ji Zahirê xatir xwest û da lin-
gan e...
Qantirçî giha bajarê Mûsilê bi ferman e
Bala xwe daye, çend xort li hev civiyane.
Got: Gelfî xortan ez ketime bextê we û
Xwedan e
Ka hela bi rayê min dibin qonaxa Tahir kîjan
e?
Xortan, bi awirên çavan îşaretên destan nişan
dane
Qantirçî bala xwe daye ku, xortek rumîştîye li
ser sekûyê
Serê xwe li nava bera her du çokê xwe
daniye.*



*Qantirçî got: Xorto gunehê te tune lê derdê te
giran e
Gava vedikin devê kulan û derdan e*

*Qantirçî digot:
Tahiro heyran banî, lo dilo banî
Hêstirên Zahirê dibarin weke çem û kani.
Mizgîn li te, min nameyek Zahirê ji te re anî
Ez bi bajarê Palo ketim, lo li wî giri
Min dî qonexek li perê cehdê, li ser rê çêkirî.
Zahirê bi çavên şilûg, derdekî mezin
nameyek nivîskirî
Lê, karwanê Mûsilê hat û lê bihurî
Vayê min hanî nameya Zahirê bi min re
hazirî. Qantirçî, dema nameya Zahirê
pêşberî wî kire
Tahir devê nameyê vedikire
Xet û nivîsa Zahirê nas dikire
Nameya Zahirê girte û di paşila xwe de kire
Qonaxa mezin seba xatirê Mizgîna nameya
Zahirê li ser qantirçî tapû kire.*

*Tahir got:
Lê Zahirê xwezî mirin-heba dil tuneba
Mala me dîsa cîranê mala we ba
Dîwarê nava min û te xera biba
Wê demê, azraîl li ser ganê min peya biba
Xwezî emrê min biqediya, mirina min li
beriya te ba
Zahirê di nameya xwe de gotiye:
Tahiro, tu negirtî yî? Tu ne di qeyd, lele û
zincîran de yî?
Tu li derve yî, lê, tu nefî bûyî.
Qey tu yê her dem li bajarê Mûsilê bijiyî?
Tahir dev ji aqil û evîna naşîniyê berda.
Got: Kî der ji min re bibe jî êdî bajarê Mûsilê
ji min re nabe.
Tahir, kete serê rîyan û dirban û berê xwe da
hêlîna evîna xwe...*

*Tahir, şevê nivê şevê giha bajarê Palo. Li
dora qesrê çû û hat, li ber şibaka eywana
Zahirê sekinî. Bangêk gazî Zahirê kir bi
dengêkî evînî. Nobedarên qesra mîr ew dîtin.
Tahir revî lê, dan dî ew girtin. Berê wî dan
zindanê, ew birin.
Zahirê, li ser wî dengê Tahir jî xewê çeng bû.
Li dora qesrê çû û hat, lê kes tunebû. Ji xwe
re got: Gelo ev xewn bû an xeyal bû? Ev
deng bû kul û kesereke mezin û li ser dilê
Zahirê rûnişt. Çawa ku heft sal berê mala
Tahiro ku bar kiribû. Ev dengê han, hîn jî wê
demê bêhtir bû. Got: Belkî Tahir nameya
min girtibe û hatibe?!
Li alî din, zabitan li Tahir pirsîn kirin. Lê,
Tahir ne navê xwe, ne yê diya xwe û ne yê
bavê xwe da, ew nas nedikirin. Zabitan,
Tahir teslimî yekî hemamçî kirin ji bo ku wî
bixebitîne. Hemamçî, ev xortê nenas bire
berber, ew çêkirin. Hanît hemamê, qatek
cilên nû lêkirin. Nihêrî ku xortekî pir delal e,
pê karê giran neda kirin. Ew kire çayxanê, pê
çay û qehwe didan çêkirin.
Keç û bûkên bajarê Palo pê hesiyan ku;
xortekî delal li hamamê dixebite. Êdî her roj
hemam bi keçan û bûkan tije û vala dibe.
Zahirê jî pê hesiya ku; xortekî nenas li
hemamê dixebite. Rabû tevî her sê carîyan
xwe rîya hemamê girte.
Xwediyê hemamê bangêk li lawikê nenas
kire. Tahir, çar heb çay hanît li ber her çar
xaniman kerem kire. Dema, lawikê nenas
çay hanît û li wan kerem kire. Gava, çavên
wan bi hev û dû kete. Weke ruhên wan di
pozên wan de bê der, a wa cemidîn di hev de.
Ev serê çend salan e ku hev û du nedîtine.
Gotin: "Belkî ev xelet be ev ne ew be?"*

Xebateke akademîk:

Bingehên rastnivîsandina kurdiyê

Digel zêdebûna xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî, pêdiviyên xwendevanan jî zêde dibin. Ji ber vê yekê xebatên li ser zimanê kurdan jî, çeperên berê yên teng, dişikênin. Çend sal berê, dema ku kurd hêdî hêdî bi ser xwe ve dihatin, piraniya berhemên bi zimanê kurdî, tiştên zargotinî û pirtûkên jî bo fêrbûna zimên bûn. Piraniya van pirtûkên fêrbûnê jî aliyê metodolojiyê ve qels bûn. Di hinekan de nivîskar hemû agahiyên xwe yên li ser zimên û kurdariyê dinivîsandin; jî rêziman û rastnivîsê bigire heta gotinên pêşyan û terîmên matematîkê... Taybetiyeke van berhemên navborî jî ev bû; rave û şroveya wan bi tirkî bû.

Piştî derketina kovar û rojnameyên bi kurdî, êdî xwendevan û nivîskarên zimanê kurdî li ser warên cur bi cur berhemên didin. Lewre jî mirov zêdetir li zimanê xwe hûr dibin; warên cuda dibin mijara lêkolînê cuda. Bo nimûne êdî, mijara dengzanî, rêziman û rastnivîsê jî hev cuda tê fikirin û her mirov bala xwe dide aliyekî zimên.

Piştî vê pêşekê em dikarin werin ser mijara xwe ya rastîn. Mijara me pirtûka Arif Zêrevan a bi navê "Bingehên rastnivîsandina kurdiyê (kirmancî)" ye. Pirtûk jî hêla We-

şanxaneya Nefel ve li Stockholm Swêdê hatiye çapkirin. Arif Zêrevan ev berhema xwe diyarî Celadet Alî Bedir-Xan kiriye. Di destpêka pirtûkê de gotinên Celadet Bedir-Xan ên ku balê dikişînin ser girîngiya zimanê kurdî cih digirin. Berî ku em dest bi nirxandina naveroka pirtûkê bikin, divê em bibêjin ku ji aliyê formê ve, pirtûk bi awayekî qenc hatiye amadekirin.

Her wekî jî navê pirtûkê jî tê fêhmkirin, pirtûk li ser rastnivîsina zaravayê kirmancî ye. Ji mijarên wekî jêgirtin, veguhastinê bigire, heta niqêşaniyê li ser gelek mijaran bi hûrbîni tê rawestîn. Bi awayekî giştî dema mirov bala xwe dide zimanê nivîskar, tê dîtîn ku ew bi ekola Celadet Bedir-Xan ve girêdayî maye. Têgihên rêziman û rastnivîsê yê Bedir-Xan hatine tercîhkirin. Bo nimûne, nivîskar di cihê "cînavk" de mîna Celadet "pronav" bi kar tîne. Lê di hinek xalên rêzimanî de jî wî vediqete. Dîsa jî pirtûkê xuya dibê ku nivîskar girêdayî devoka herêmekê Kurdistanê maye. Dema ew dixwaze dîtînen xwe bidê selmandin jî, serî li klasîkan û devoka derdora Botan û Behdînan dide. Bi taybetî di mijarên wekî tewanga navdêrên nêreza û jîmarnavan, veqetandekên nebinav-

kirî de Zêrevan jî Celadet Bedir-Xan cuda difikire. Tevî ku Celadet Bedir-Xan dide zanîn ku navdêrên nêreza bi du awayan dîtewin (wekî bajêr û bajarî) jî, nivîskar hemû navdêrên nêreza bi partîta /-î/ dîtewîne. Dîsa berevajî dîtina Mîr Celadet Bedir-Xan, li gorî Arif Zêrevan zayenda hemû jîmarnavan mê ye. Yanê divê yek bibêje: yekê, duyê, sêyê, çarê, pêncê... ji bo vê yekê jî, ew jî Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî mînanan dide. Her wiha di pirtûkê de li ser veqetandekên nebinavkirî jî ramaneke ji ya Celadet Bedir-xan cudatir heye. Li gorî nivîskar Arif Zêrevan, dema rengdêrek piştî navdêreke ku veqetandeka nebinavkirî ya nêreza girtiye tê, ew veqetandeka binavkirî /ê/ digire, lewre jî divê mirov nebêje "hevalekî baş", divê bibêje, "hevalekê baş"... Her çiqas ev mijar hêjayî gengesiyê bin jî, hinek delîlên ku wî pêşkêşkirine, zêde xurt xuya nakin.

Pirtûk bi giştî, gelek warên rastnivîsina zaravayê kirmancî zelal û diyar dîke. Mirovên ku dixwazin, prensîbên rastnivîsê hîn bibin û li gorî rêz û rêçikên akademîk nivîskariyê bikin, dikarin jî vê berhemê sêdê wergirin.

SERWÎSA ÇANDÊ



Weşanxane: Nefel
Tenstavagen 102 1 tr
163 65 Spanga/Sweden

Dilojarê

MEDENÎ FERHO



Piraniya gotinên kurdî di nava kevniyaya salan û pêhatiyên mezin de hatine afirandin. Her gotin li ser bingeha xwe bi raman û hişmendiyê ku sal û demjiyanên dûr dirêj ji xwe re kirine palik û pêgih, gihane roja me. Bêguman tevger û guhartinên civakî, têkilî û danûstandinên gotin û ziman jî çêdibin. Çi di hêla bazirganî de, çi der barê jiyan û baweriyên olî de be, ev guhartin û nûjenî xwe diyar dîke. Nexasim gelên mîna kurdan ku bi salan e welat, çand, dîrok, wêje di bin bêzarî û talaniya dijwar de gevzeka mirinê dîke. Ji bilî vê, bi amancek dûr û kûr dijmin nêzîkî zimanê kurdî, dîrok û çanda kurdî bûye û her xwestiyê jî holê rake, bêwate bike, misrî û qersifî bihêle. Zimanekî ku pê lêkolîn nebin, roman neyên nivîsandin, dîrok, helbest, cografya, fîzîk, kîmya neyê nivîsandin, folklor neyê parastin, pirtûkxaneyê wê nebe, dibistanên perwerdehî nebin, her wiha dewlet nebe, neteweyî di bin sifirê re pênçî pile be, bêguman rewşa wê dilojarê ye. Guman

dikim her kes maneya vê gotinê dizane. Lê, ku herêma Xerza, çi di nava axaftinê de be, çi di stranên Miradko de be, çi qîrên û awaza jineke diibikul be, dilojarê tê bîra min. Ji ber ku tu kes mîna jinê Xerziyan nikare dilojarê bibêje û biafirîne. Şer û stranên mêraniyê bi piranî jî vê hêlê derketine û mîna tevî û neqşa ronahiya çavan ku li lorzanî hatine hûnandin, gotin li dût hevûdin bi rîştine hevrişmî hatine darvekirin. Di paşerojên de ev keda têr kulî û axî wê bibe çavkaniyê mezin ji dîroka civaka Kurdistanê re. Çi êl û xanedanî û çi malbatî û têkiliyên bi dewletê re bin, di nava vê hûnandina dilojarêya ku têr kulî û xemgînî ne, cihê xwe girtine.

Dilojarê rewşa civaka kurdî ya xemgîn jî nîşan dide. Ne tenê di hêla civakê de, di hêla rewşenbîrî û nivîsa kurdî de jî rewşeke tengzar nîşan dide. Ku di qonaxa îro de rewşenbîrî û nivîskarên kurd bi xwe jî di nava vê dilojarêya têr kulî û xemgînî de digevizin. Mîna kurdên soran dibêjin "be daxewe", kurdî heya îro bê ferhenga bi rêkûpêk e. Ku mirov li pirtûkxaneyê kurdî dinêre, dilojarê tê bîra mirov. Ku mirov li nivîskarên kurd dinêre, cardin rewş dilojarê ye. Beşek jê bi kurdî nizane, bi tirkî dinivîse, tu hewlên fêrbûna zimanê xwe yê zikmakî nade, beşek jê, bi ramaneke tirkî dirame û bi kurdî dînivîse, tiştê ku ew bi xwe jî diafirîne fêhm nake; beşek jê qet naniyê lê xwe zimanzan dibîne û pişeyê wî çi be, xwe diavêje nava her

guftûgoya zanistî. Yanî rewşek dilojarê ye, nalîn û keserên kur jê diwelin.

Aya ev rewş wê çawa bê guhartin? Heya niha gazin bûn. Gelo çareseriyê mezin çi ye?

Bersiva vê pirsgerêka mezin yek pirs e. Yanî em dê bersiva gazinên xwe bi pîrsekê bidin. Êdî hewlê dimîne di hêla mêrên çê de. Gelo em kurd çima li gelê din ê cihanê nanêrin, bê ka çawa gav avêtine, çi kirine û çawa hewl dane; jî ber ku ne em tenê, bi giştî gelên cihanê teva di vê qonaxê re borîne. Di nava rewşek dilojarêya têr kulî û nalînî de borîne. Bi nav ser û çavên hevûdin ketine, doza rêveberî û desthilatîyê li hevûdin kirine. Mîna ku Karolenjan xanedaniya Merove pêşî qels kiriye, piştî re têk birine, hevûdin jî holê rakirine.

Ta ku bingeha Ewropa hatiye avêtin. Tenê mîna kurdan bi xiyaretê re di nava aştiyê de nejiyane û tu çaran mîna me kurdan rîya veketin û firehbûna xiyaretê nedane û kesên xayîn efû nekirine. Pêwîst e ku em kurd jî mîna her kesî pêwendî û binbariyên xwe binin cih, da ku paşerojên kurdan ronî bibin, nişên piştî me di nava tolaziyên bêwate û bêderfet de nemînin.

Li hemberî her asteng û pirsgerêkan rojane û teknîkî pêdivî bi gavavêtinên zexim heye, da ku ev rewşa dilojarê ya têr kulî û nalînî xelas bibe.

Helal û heram

Depoyên xwedê

Elikê Hilwa (ji gundê Stîlîlê ye) rojekê diçe tehta Şîrêzê êzîngan: Ji bilî nanekî hişk û dezi-girtî di tûrikê wî de tişteke tunebû. Ber bi nîvro birçî dibe, diçe tûrikê xwe yê bi deviyê ve daleqandî vedike, dibîne ku ew nanê dezi-girtî nayê xwarin. Nanê tisî; bêav û bêtişteke. Dinêre ku şivanê pez li bin daran mexel kiriye. Ji şivan tasek şîr dixwaze ku bi nanê xwe re bixwe. Dilê şivan pê dişewite. Tasek şîr ji bizina mala Pexê didoşe, di-de Elî. Elî ji bo ku hinekî bicemide û nanê wî ji nerm bibe, nanê xwe diqêşîrîne nav tasa şîr û datîne bin siya darekê. Elî bi êzingên xwe dadikeve û hey meyla wî li ser firdoqa wî bû jî. Gelek birçî bûbû, lê li benda sarbûna şîr û nermbûna nanê xwe bû.



Cewrikê (kuçîk) şivan tê tasa şîrê Elî tev li nanê wî dixwe. Elî radihêle ferşekî û hêdika ber bi cewrik ve diçe û li nav piştta wî dixwe. Ji zorê re xwarin di dev û pozê cewrikê diavêje. Elî tasê li ber xwe datîne û têr dixwe. Şivan vebûyêre bi çavên xwe dibîne û tê ba Elî, dibêje: "Wele ew xwarina te li gorî ola me heram bû." Elî dibêje: "Na wele ne heram e. Ma tu ji Mela Şêxmûs bêhtir

dizanî? Wî tim digot ji birçiyên re heram-meram nîn e."

Danê esir diçe, dûv re berê dide derxanê, nav civata gund. Dinêre mele Şêxmûs rûniştiye wazan dide. Jê dipirse, dibêje: "Xalê mele, îro ev bûyer bi serê min de hat. Gelo helal e, an heram e?" Mela Şêxmûs dibêje: "Ger tu ev çend birçî bûbû ku te nikaribû xwe bi-

gihanda gund û giyana te ketibû talûkê, xem nîn e. Ji bo domandina jiyanê tişteki heram nîn e."

Elîkê Hilwa dibêje: "Tu ji xwe re li xalê melê binêre lo, bê çi qas olê asê û teng dîke! Ma li tahta şîrêzê tivinga çapilî li bin çengê min biketa, min ê xwe bi saxî û zindî bihiganda mal.."

BRO OMERÎ

Li gundekî Mêrdînê mele-yek hebûye. Ev mele xwe pir zana dibîne û xwe wilo jî dide nîşan. Di civînan de li ser mijarên zanistî û olî hişê mirovan ronî dîke! Dîsa di civînekê de mele ji yê civînê dipirse:

- Hûn zanin baran, berf û teyrok (zîpik) çawa dibare?

Civat:

- Çawa dibare seyda?

Mele:

- Depoyên Xwedê li banî hene. Dema ew li banî deriyê depoya baranê vedike, baran dibare; ku yê berfê vedike berf dibare, wilo yê kîjanê vedike ew dibare.

Dîsa ji civatê dipirse:

- Carinan di dawîya zivistanê de berf hûr hûr dibare. Sebebê vê çi ye?

Civat:

- Çi ye seyda?

- Ew, depoya Xwedê vala bûye. Xwedê berfa binê depoyê dimale. Ji ber vê yekê berf hûr hûr dibare.

FÎRAT ASLAN

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (91) XAÇEPIRSA

G	A	Ş	M	H	M				
C	U	M	A	T	A	K	T	E	R
H	O	K	E	R	Y	A	S	A	
B	A	Ş	P	I	R	A	M	I	D
R	E	K	N	A	D	I	R	E	
Ü	K	Y	N	A	V	L	E	R	
F	N	A	R	E	E	K			
T	A	V	G	E	K	O			
M	E	J	U	Z	A	N			
T	E	J	I	K	R	E			



Bersiva Xaçepirsa 89'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesên belav bikin. Xelata hejmarê me ya 91'ê pirtûka Mahmut Alınak "ŞIRO'nun Ateşi" ye



Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşari" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 89'an Pirtûka Torî "Kürtlerin İlkçağ Tarihi ve Kültürü" qezenc kirine: Sadım Temel/Manisa, İbrahim Altınışık/Eliz, Mikdat Kaya/Mersin, Şîret Okçu/Amed, Zeki Kaya/Semsûr

Bi tirkî xweli	Navêki jinan	Bi kirdkî bêhn	Tevgera hewayê	Tîpa dawîn	Dûman
Şehidek (Wêne)	Zinar	Dijberê "rake"	Tîqe..	Çita	5
Bergerîn					Çeşme
Tipeke kurdî				Akûmûlator Cînavkek	
	Germahî		Kenar, kêlek		
	Yarmeti		Berhemek e şîr		
Roja em tê de	Zelal, diyar		Weki, fena, nolî		
	oksijen		Kidîk		
		Riç, riş reh dengdarên 'sim'		Tûne	9
Encam	Jî bêjîngê mezintir Xwedan erd			Esîrî	1
		Xweli Zîrina keran			
Xak					
Îstîqrar		Hîş			6
			Kijk		



PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7 8 9

Daw

* Tîrsa TC. yê nû; Jinên hemilê wê biteqin.



Di rojekê de du rûdan û azadiya derbirinê

Xelata ku Yaşar Kemal girtibû, derî li nîqaşê vekir. Girtina Parêzer Eşber Yağmurdereli jî nîqaşa li ser rewşa mafê mirovan û azadiya derbirinê gurtir kir.

Roja 19'ê mehê romanivîs Yaşar Kemal xelata weşangerên alman girt, di heman rojê Parêzer Eşmer Yağmurdereli jî bo cezayê ku ji ber axafîneke xwe lê hatibû birîn, li ber deriyê Kanal-D hate girtin. Bi van her du bûyeran mijara mafê mirovan û kêşeya kurd ji nû ve hate rojevê.

Medya tirk bi piranî ji ber vê xelatê pesnê Yaşar Kemal da û ew bûyer wekî serfiraziya Tirkiyeyê nîşan dan. Lê hinek nivîskar li dijî vê helwestê derketin û ew helwest wekî durûfî bi nav kirin. Bo nimûne nivîskarê rojnameya Yeni Yüzyılê Ali Bayramoğlu da zanîn ku divê, kesên pesnê Yaşar Kemal didin ji dil bin û ji guhartina rewşa Tirkiyeyê ya ku Yaşar Kemal jê zivêr e, piştevaniya wî bikin.

Yaşar Kemal jî di axaftina xwe ya berî girtina xelatê de bal kişand ser şerê qirêjî, rewşa kurdan û bînpêkirina mafên mirovan. Lê tv û rojnameyên tirk çavên xwe ji wan gotinan re girtin. Di ser de jî hinek kesên wekî Yavuz Donat xwestin kes ji gotinên Yaşar Kemal zivêr nebe, lewre ew nivîskar û rewşenbîr e, kesên bi vî rengî hin caran, gotinên jî rê der jî dikin. Li aliyê din sernivîskar rojnameya Turkish Daily News İlnur Çevik, her wekî Bayramoğlu helwesta çapemeniyê rexne kir û da zanîn ku divê çapemenî heke bi rasti hez ji Yaşar Kemal dike guh bide gotinên wî da ku mercên ji bo girtina wî û Eşber Yağmurdereli jî holê rabin.

İlnur Çevik di quncikê xwe de roja 21'ê mehê jî bal kişand ser rewşa çalaki-

yên gerîla yên herêma Derya Reş û da zanîn ku divê ji kêşeya kurd re çare bê dîtin. Çevik diyar dike ku gotinên li ser destkariya hêzên derveyî di warê gurbûna çalakiyên PKK'ê pûç derketine, lewre tu hêzên derveyî nabêjin bila PKK here li herêma Derya Reş çalakiyan pêk bîne. Çevik dibêje, kes nikare înkare bike ku PKK jî hinek hêzên derveyî alîkariyê digire, lê sedema sereke ya xurtbûna PKK'ê kêşeya kurd e. Lewre jî divê medya tirk û rayedarên tirk êdî tê bigihêjin ku bi metodên berê kêşeya kurd çareser nabe. Li gorî Çevik, kurd dixwazin ku wekî wela-tiyên Tirkiyeyê yên ji rêza pêşin bînin hesibandin, lê digel hinek gavên ku van rojên paşin hatin avêtin, hê jî kurd nebûna wela-tiyên Tirkiyeyê yên ji rêza pêşin.

Xelata ku Yaşar Kemal girtibû, derî li nîqaşê vekir. Girtina Parêzer Eşber Yağmurdereli jî nîqaşa li ser rewşa mafê mirovan û azadiya derbirinê gurtir kir. Yağmurdereli roja 19'ê kewçêrê piştî ku beşdarî bernameya Fatih Altaylı ya bi navê "Teke Tek" bû, li ber deriya televîzyona Kanal-D'yê hate girtin. Ev yek li hundir û derve bû sedema reaksiyonên tûj. Bo nimûne dewleta alman kirina rayedarên tirk şermezar kir. Yağmurdereli her wekî berê ku di gelek rojnameyan de anîbû zimên, di bernameya navborî de jî diyar kir ku azadiya wî pirsgirêka wî nîn e, lewre ew bi xwe re civakê jî dibê zîndanê. Parêzer Yağmurdereli da zanîn ku ew dixwaze bi vê helwesta xwe, rê li ber azadiya derbirinê veke.

NAVENDA NÜÇEYAN

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMI TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nünerê Giştî yê
Ewropayê)

Mahmut Gergerli
49 871 67 08 84

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiç

Berlin:
Silêman Sîdo
00 49 30 691-6495

Hannover:
Selim Biçûk
49 572 18 13 60

Stockholm:
Robin Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43



Divê zanîngeh çavên xwe ji şerê qirêjî re negirin

"Her çiqas perwerdehî peywireke welaîbûnê be jî, ev gotin jî bo Tirkîyeyê ne rast e. Saziya YÖK'ê alîgir e, kemalist e û zordest e. Dixwaze şexsên nijadperest û kemalist bigihîne. Êdî ev yek hatiye asteke wiha ku, dixwazin sistema kemalizm û nijadperestiya tirk bixin mejiyê xwendekarekî pakîstanî, îranî, japonî jî."

Roja 18'ê kewçêrê li Navenda Çanda BEKSAV'ê panelek bi navê "Pirsgirêkên Rojane yên Zanîngehan" hate lidarxistin. Di panela ku bêhtîrî 50 kesî beşdar bûn de, wekî axifger Endamê Sendîqeya Perwerdehiyê Hayri Kozanoğlu, jî: "Tevgera Xortên Demokratîk" Kutbettin Güneş û li ser navê xwendekarên zanîngehan Hakan Günaslan beşdar bûn. Panela ku ji hêla endamê kargerîya BEKSAV'ê Av. Metin Kozan ve hate birêvebirin; ji du beşan pêk hat. Piştî axaftinan, Kozanoğlu, Güneş û Günaslan pirsên beşdaran bersivandin.

"Asîmilasyona li Kurdistanê 5 sal bû, niha bû 8 sal"

Di panelê de axaftina yekemîn ji hêla Kutbettin Güneş ve hate kirin. Kutbettin Güneş ji ber ku, di bûyerên 19'ê pûşperê yên ku li Zanîngeha Marmarayê li Kampûsa Göztepeyê qewimîbûn de, bûbû hedefa faşîstan û lingên wî şikestîbûn li ser daran hatibû panelê. Güneş di axaftina xwe de bal kişand ser mijarên wekî; perwerdehiya demokratîk, pirsgirêka xer(a)can, perwerdehiya

bi zimanê zikmakî (zimanê kurdî), li Kurdistanê şerê qirêjî, dibistanên razangehî (mecanî), paqijî û starbûna wargehan (yurt) û hwd. rawestiya û da zanîn ku her çiqas ew zanîngehên demokratîk dixwazin jî, li holê perwerdehiyê faşîzan heye û axaftina xwe wiha domand: "Di sistema perwerdehiya zanîngehan de pirsgirêka arizîkirin (Özeleştirme), pirsgirêka xercan û pirsgirêka sistema îmtîhanên navendî li ber xwendekar û ciwanên zanîngehan ku ji nava çîna kedkaran tên, astengên herî giran in." Kutbettin Güneş di axaftina xwe de girîngiya zimanê zikmakî bi lêv kir û da zanîn ku, li Kurdistanê zarokên kurd nikarin xwe bi zimanê kurdî ifade bikin, lewre jî ji kesayetiya xwe ya rastîn dûr dikevin. Her wiha Kutbettin Güneş der barê perwerdehiya 8 salan, dibistanên razangehî, şerê qirêjî û hestên şoven de ji wiha got: "Perwerdehiya 8 salan bi taybetî ji bo zarokên kurd hate rojevê. Ji ber ku li Kurdistanê asîmilasyona 5 salan têrê nekir, xwestin ku di nav 8 salan de mejiyên wan bi hest û ramanên şoven û kemalist dagirin, ji dibistanên razangehî armanc ev e ku zarokan ji malbat û civakê dûr bixin.

Her wiha li dibistanên razangehî bi kadroyên faşîst û oldarên sexte tijî bûne. Ji ber ku hestên kurdan ji hêla olî ve xurt in, dixwazin bi riya olî kurdan ji rastiya wan dûr bixin. Îro li zanîngehan jî wekî sistema faşîst, tê xwestin ku em çavên xwe ji şerê li Kurdistanê pêk tê re bigirin, li hêla din hestên şoven her ku diçe zêde dibin. Divê li zanîngehan li dijî şerê qirêjî xebatên xurt bînin kirin û daxwaza aştiyêke birûmet bê zimên."

"Zanîngeh ji zanistiyê dûr in"

Piştî axaftina Kutbettin Güneş, li ser navê xwendekarên demokrat Hakan Günaslan axivî. Günaslan di axaftina xwe de da zanîn ku serdest tu carî perwerdehiyê ku ji ramanên serbixwe û azad pêk tê, naxwazin. Hakan Günaslan mîna astengên sereke; hebûna polîsan û êrişên faşîstan destnîşan kir. Günaslan li ser pûçbûna naveroka perwerdehî û YÖK'ê wiha got: "Qewmînen mîna Çernobîl, Susurluk û Bergamayê pêk tên, lê ji zanîngehan, ji dekan, profesor û doçentan deng dernakeve. Her kes saziya YÖK'ê (Saziya perwerdehiya bilind) mîna pîrebokê (öcü) dibîne, lê mixabin xwendekar jî û

polis jî der barê vê saziyê de ji agahiyên rasteqînî bêpar in. YÖK jî 24 profesoran pêk tê, lê bi tenê 7 profesor jî hêla saziyên zanîngehan ve têne hilbijartin. Serokomar heft, MGK heft û Serkaniya Giştî jî profesorekî/ê dihilbijêre. Gele wê saziyêke bi vî rengî çiqas karibe di bin xizmeta zanistiyê de be?" Her wiha Günaslan da zanîn ku li vî welaî kesên ku pere û dolarên wî/ê hebin dikarin bixwînin. Hakan Günaslan beriya ku axaftina xwe biqedîne daxwazên xwendevanan wiha rêz kirin: Perwerdehiya serbixwe, demokratîk û bê pere û bêyî liberçavgir-



Hayri Kozanoğlu

tina cudatiya di nav dîn, ziman, netewe û mezhebên de....

Hayri Kozanoğlu: "Dixwazin xwendevanên pakîstanî ji bin kemalist"

Hayri Kozanoğlu, di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser cuntaya faşîst ku di 12'ê rezberê de pêk hatibû û pişt re jî got ku ji wê rojê û şûn de tevahiya fikr û ramanên demokratîk hatine çewisandin û ev yek îro jî didome. Kozanoğlu di axaftina xwe de daxwaza "ji bo civakê zanîngehên zela" anî zimên û bi bir xist ku ev daxwaz tu carî li Tirkîyeyê pêk nehatiye. Her wiha wî, serhildana xwendekaran mîna serhildana gel bi nav kir. Kozanoğlu di axaftina xwe de li ser ramanên cihê wiha axivî: "Divê perwerdehî bêalî be, her çiqas perwerdehî peywireke welaîbûnê be jî, ev gotin jî bo Tirkîyeyê ne rast e. Saziya YÖK'ê alîgir e, kemalist e û zordest e. Dixwaze şexsên nijadperest û Kemalist bigihîne. Êdî ev yek hatiye asteke wiha ku, dixwazin ramanên kemalist û nijadperestiya tirk bixin mejiyê xwendekarên pakîstanî, îranî, japonî û hwd. Ev 20 sal in ku min tu carî wekî van salan rewş xerab nedîtiye. Berê ev qas pest û kotekî tunebû."

Piştî axaftina Hayri Kozanoğlu, beşdaran gelek pirs arasteyî axifgeran kirin. Xwendekarekî ji ÎTÜ'yê di pirsê xwe de Hayri Kozanoğlu rexne kir û got ku wan di çalakiyên xwe de Kozanoğlu û kesên wekî wî li cem xwe nedîtine. Pirsê beşdarekî bi rengê "Çima xwendekarên zanîngehan jî hev belav bûyî ne" jî Kutbettin Güneş wiha bersivand: "Sistemê hêza xwe ji belavbûna me digire, divê em jî hêza xwe bikin yek û êriş bibin ser sistemê. Lê mixabin hêzên çepgir bêyî ku şûrên xwe li faşîzmê rast bikin, dikevin qirika hev."

SALIHÊ KEVIRBIRI

